



Danerê Rojnameya Kurdî a pêşî
Miqdad Mûhed Bedirxan

Armanac

Hejmar, No: 129
Heziran-Tîrmeh
June-July 1992
Buha - Price
15 SKR, 3DM

Rojnameya Mehane

Êriş, ambargo û nerazîbûnên her çar dewletên dagîrker pere nekir:

Hukûmeta Kurdistanê ava bû



Di roja 04.-07.1992'an de li bajarê Hewlêrê, li parlamentoya Kurd, hukûmeta sêyem ya Kurdistanê hat îlankirin. Wezîran yeko yeko sond xwarin. Kafîye Xanim destê xwe daye ser Quranê û sond dîxwe.

(Foto: Haydar Diljen)

□ Navê Hukûmetê Meclisa Wezîrên Herêma Kurdistanê Îraqê ye

□ 15 Wezaretên Hukûmeta Kurdistanê hene

□ Alaya Îraqê li Parlamentoya Kurdistanê nayê daleqandin

Piştî hukûmetên Şêx Mehmûd Berzencî, hukûmeta Komara Kurdî ya Mahabadê, di dîroka nêzik ya Kurdistanê de, li parlamentoya

Kurdistanê Îraqê di roja 04.-07.1992'an de li bajarê Hewlêrê, bi beşdarbûna parlamenterên Kurd, nûnerên partî û rêxistinên siyasî û hejmareke mezin ji gelê Kurd, hukûmeta sêyem ya Kurdistanê hat îlankirin.

Di roja 15.6.1992'an de li parlamentoya Kurdistanê li ser navê hukûmeta ku wê bê danîn, du pêşniyar hatin munaqesekirin. Yek ji wan "Meclisa Wezîrên Herêma Kurdistanê" bû, ya din "Meclisa Wezîrên Kurdistanê Îraqê" bû. Di celseya 16.6.1992'an de bi piraniya dengên parlamenteran biryar hat dan ku navê wê MECLISA



Dr. Fuad Mahsum

Di 1938'an de li bajarê Koyê ji dîya xwe bûye. Di salên 1961-1968'an de seperiştîya radyoya Kurdî ya li Misirê kirîye. Di salên 1969-1972'an de li Unîversîteya Basrayê mamoste bûye. Di 1974'an de li Unîversîteya Qahîreyê li ser Felsefê doktora kirîye.

WEZÎRÊN HERÊMA KURDISTANA ÎRAQÊ be.

Piştî danûstandin û munaqeseyên di navbera grûbên partî û rêxistinên li parlamentoyê, endamên hukûmetê bi awayê li jêr hatin dest nîşan kirin:

Dûmahîk: r. 11

“Bijî Hukûmeta Kurdistanê”



Danielle Mitterand û Bernard Couchner li Kurdistanê Îraqê pîrozbahîya Wezîrê Kulturî Şerko Bêkes dîkin

Di roja 4.7.1992'an de, roja îlankirina hukûmeta Kurdistanê, seroka Weqfa Azadî ya Fransî Daniele Mitterand, wezîrê tenduristî û

Alîkariya Mirovî ya Fransayê Bernard Couchner di gel heyeteke Fransî hatin Kurdistanê, bajarê Hewlêrê û bi serokwezîr Fuad Mehsûm, serokê parla-

mentoyê Namiq Cewher, serokê PDKî Mesûd Barzanî, nûnerên rêxistinên

Dûmahîk: r. 11

Sê rêxistin bûn yek û... YEKBÛN ava kirin



PPKK (Partiya Pêşeng a Karkerî Kurdistan), KUK-SE (Rizgarîxwazên Netewî yên Kurdistanê-Meyla Sosyalîst) û KAK (Komela Azadiya Kurdistan) di meha Heziranê de li Kurdistanê bi beşdariya nûnerên her sê hêzan bi kongreyekê yekîtiya siyasî çêkirin. Navê partiya nuh; "Partiya Yekbûyî ya Gelê Kurdistanê" bi navê kinkirî (YEKBÛN) e.

Armanca stratejîk a nêzik a YEKBÛN'ê, zelaskirina welatê me ji bin nîrê kolonyalizmê, tasfîyekirina bermayiyên feodalîzmê, pêkanîna guhertinên bingehîn yên demokratîk û damezrandina cumhuriyeteke demokratîk e.

nûca wê r.2

Pêla cînayetên qesasnediyar roj bi roj firehtir dibe

□ Li Kurdistanê û bi taybetî ji li der û dorên bajarên Diyarbekirê, Mêrdînê û Sêrtê cinayetên dewletê û yên Hizbullahê pêl bi pêl fireh dibin. Li van bajaran di sê mehên dawiyê de zêdeyî 100 kesî hatin kuştin.



Di 5 ê Hiziranê de navekî din li lîsteya "cînayetên meçûl" zêde bû. Hedef wek gelek caran cardin bajarê Kiziltepe bû û kuştîyê nuh ji welatparêzê dilsoz Seydo AYDOĞAN bû. 5 ê mehê roja îniyê wek hemû rojan Seydo

sibê seet di 7 û 40'î de ji mala xwe derdikeve û diçe mala hevalê xwe (ku ew ji mamoste ye) daku bi hev re herin

Dûmahîk: r. 2

Rojeva Mehe

Di xwedanşexsiyeta milî de şerpezetiya me

Di van salên dawîn de, ku tevgera nûhişyarbûyî ya Kurdistanê Tirkîyê, gelekî bala xwe dide ser hewla naskirina tarîxa Kurd û Kurdistanê, ronakbîr û siyasîyên Kurd di warê nazari û ramanwerî de di hewla pêşkêşkirina hin encaman de ne. Yek ji wan encamên derxistî yên ku di rewacê de ne ew e ku, li ser tunebûna şexsiyeteke serbixwe ya milî ya Kurdan tê berpêşkirin. Gelek ji me, bi rehetî hukum didin ku di tarîxê de Kurdan tim şûrkêşiya xelkên biyanî kirine, tu carî li ser zemînekî milî yê li gor menfeeta xwe, xwe negihandine hev û li ser esasê vî zemînekî milî siyasetek serbixwe ya xwedî şexsiyeta milî nemeşandine. Helbet rûpelên tarîxa miletê Kurd wek ku hinek ji xwediyên van îdiayan dixwazin nişan bidin hemû ne bi vî awayî reş û tarîbin jî, tarîx bi rûpelên zêrîn ên bi heysiyet û hurmet û evîndariya jiyana serbilind a serbestî û azadiyê dagirûbin jî, hin rastî di van îdiayan de hene.

Lê gelo rast e ku nebûna şexsiyeta milî ya serbixwe di tarîxê de maye. Gava meriv berê xwe dide îdiayên gelekên ji xwediyên van bîr û baweriyên, meriv dibîne ku dixwazin bêjin ku ev tişt berê hebûn îro lidarketina hemleza nuh a milî, her wekî di her warî de, di vî warê de jî rûpelên reş û tarî çirandine, vejandina şexsiyeta milî ya serbixwe tîrêjên rohiya xwe bera nav ruhîyeta nesla îro daye. Mixabin ku ew qeneeta ku di vî warî de ji bo neslê civaka me ya niha peyda bûye, ne rast e, xwe naspêre rastiya jiyandê, li ser hin palpiştên xeyalî yên ji mij û dûmana rojane peydabûyî, hatine avakirin. Bêbingehiya vî qenaetê, gelekî balkêş e ku herî pirtir jî li derûdorên xwedan îdiayên wiha diyar e.

Ronakbîr, nivîskar, siyasîmedar û sermîyandarên Kurdnîjad ên ku hê di qonaxek wek ya îroyîn de jî, ciyê xwe di nav dezgeh, muese û qorên Tirkan de pahn kirine, helbet nimûneyên herî fahş ên berbiçav ên vî rastiyê ne.

Lê nimûne ne tenê bi vî yekê ve sînorkirî ne. Nesla me ya ronakbîr a nuh û ciwan ku xwedêgiravî bi barê milî û şoreşgerî rabûye, xwîn û xureka fikrên xwe yên bi navê îdeolojiya şoreşgeriyê û anti-empyralîzmê, ji îdeolojiya çepên Tirk distîne ku ew bixwe ji alî civaka xwe ve hatine avêtin, civaka Tirk bixwe tu qîmetê nade wan, wek insanên afarozkirî li dervayî civaka xwe mane. Hin ji wan jî li ser navê dewleta xwe, bi mexseda şaş û fahşkirina bîrûbaweriyaya şoreşgerî û welatparêziyê teoriyên bêbingeh ên anti-empyralîzm û şoreşgeriyê diafirînin û dijînin. Bi vî yekê jî namîne, hinekan ji me ev kesên wiha anîne di komele, înstîtu, rojname û dezgehên xwe yên din de kirine şewirdar, aqilmend, nivîskar û rêberên xwe. Ew di ciyê wiha de, dinivîsin ku em çiqas bêmeji ne, nezanan, nikarin xwe idare bikin û riya xwe bibînin. Dersên şoreşgeriyê, anti-empyralîzmê û Kurdîtiyê didin me.

Nimûneyeka herî diyar a rebeniya me ya di warê hebûna şexsiyeta milî ya serbixwe de e we ku çendekî berê bi wesîla dengdaneke li Meclîsa Tirkîyê, li ser mayin û nemana "hêza çakûç" derket holê. Parlamenterên me yên Kurd ên HEP'î, sê kes ne tê de hemû roja ku ji bo mayin û nemana "hêza çakûç" li Meclîsa Tirk deng bînin dayin, bi zanebûn nehatin Meclîsê. "Hêza Çakûç" ew hêz e ku, gava li Kurdistanê Iraqê ferman li bi milyonan Kurdan rabû, bi zora raya giştî ya cihanî, hukûmetên mutefîk mecbûr man ew anîn li Kurdistanê bicîhkirin da Kurd jî qetlîfamekê xelas bibin. Îro jî ji bo wê yekê mane ku rê li ber êrîşa dîktatorekî devbixwîn ê wek Seddam bigrin ku nikaribe êrîşê bibe ser vî gelê haldijwar. Tirkîyê rê daye ku ew li wir bimînin, lê di riya meclîsa xwe re ji şeş mehan carekê, biryara mayin û nemana wan dide.

Ên ku li dijî mayina vî hêzê ne, dîktatorên wek Seddam in, rejîma Iranî ya dijîmîne milet e, kevneperest û şovenîstên Tirk ên wek Ecevit û Perinçek û rast û çepên wek wan in, ku tîrsa wan a herî mezin ew e ku vî rewşa peydabûyî ya herêmê rê bide dewletek Kurdan a serbixwe. Loma jî her roj diqilqilin hin bi navê anti-empyralîstî û şoreşgerî, hin bi navê şovenîzm a Tirk û hin jî bi navê dîndariyê dixwazin ev hêz ji herêmê vekişe. Mexseda wan diyar e. Ew menfeeta dewleta xwe diparêzin. Lê gelo mexseda wan parlamenterên me çibû ku di meselek ewqas girîng a bi qedera miletê wan bi xwe ve girêdayî, ji meclîsê bazdan da ku dengê xwe ji bo mayina vî hêzê nedin? Ew dibêjin em Kurd in. Kurdan dengê xwe dan wan da bikaribin li wê meclîsê û bi îmkanîyatên parlamentariyê menfeetên miletê xwe yê bindest biparêzin. Gava dor tê peyvê jî miletperweriyê ji kesî re nahêlin. Lê di rojek wiha de eşkera diyar dikin ku bi çiqasî, ji temsîla parastina menfeetên gelê Kurd dîrin in, hissên milî yê Kurdîtiyê, berpirsiyarî û cidîyeta xwe û miletêxwenasîne di ruhê wan de kiz (qels) e. Çiqas hindik nesibê xwe ji tîgîhîştina şexsiyeta milî ya serbixwe girtine. Heke ne ev bînesîbiya wan be, lê gelo çiyê? Gelo hin bi fitîkê wan talîm dikin? Mesele ev be jî netîce derdikeve ser xala pêşîn. Yekî ku nesibê xwe ji şexsiyeta milî ya serbixwe têr girtibe, ji devla têkeve halekî wiha şerpeze, wê biçe bêdeng li mala xwe rûnê.

Lê mixabin ev gîhaştin û fêmkirin di me de peyda nebûye. Em dikarin bi rehetî pir zû xwe şerpeze jî bikin û em dikarin vî şerpezetiya xwe wek qehremanî nişan bidin. Ne bêsebeb e ku di destpêka sedsala 21'ê de hê jî em di vî bindestî û belengaziyê de ne. Heta ruh û şûra me bi şexsiyeta milî ya serbixwe ne kemile em ê hîn jî di vî halî de bimînin.

**Sê rêxistinên bûn yek û...
YEKBÛN hat avakirin**

Di tîkoşîna gelê Kurd a ji bo mafên netewî û demokratîk de gaweke nuh û dîrokî hat avêtin. Sê hêzên siyasî; KAK, KUK-SE û PPKK bi kongreyeke muştêrek, li Kurdistanê, di meha Heziranê de yekîtiya xwe pêk anîn. Beşdarên kongrê jî sedî 95 nûnerên rêxistinên welêt û sedî 5 jî nûnerên rêxistinên derveyî welêt bûn.

Di Kongra Yekîtiyê de li ser rewşa aktuel a Kurdistanê, herêmê û ya cihanê, li ser armancên nêzîk û dûr û yên stratejîk û taktîkî hat rawestandî. Herweha li ser metod û uslubên tîkoşînê û xebatê, tîkîliyên di navbera hêz û perçeyên Kurdistanê de gelek dîtin hatin pêşkêşkirin û biryar hatin girtin. Kongrê ehemiyetek girîng da kar û barên xebatên yekîtiya siyasî û da xuyakirin ku gava bi vî yekîtiyê hatiye avêtin pîrsa yekîtiya siyasî li Kurdistanê Bakur jî binde hel nekiriye, ev yekîtiyê gaweke pêşîn a vî xebatê ye. Ji bo vî yekê jî kongrê selehiyetek mezin da Komîta Merkezî

ya nuhîlbiyarî. Kongra Yekîtiyê muswedeyên destûr û programê yên ku berê li ser hatibûn munaqesekirin, carek din munaqesê kir û tevî hin guhertinên nuh qebûl kir. Ji bo kar û xebatên dahatû biryar girtin.

Komîta Merkezî ya YEKBÛN 'ê li ser encamên kongrê belavokek weşand. Di belavokê de yekîtiya her sê rêxistinên wek gaweke pêşî ya yekîtiya sosyalîstên Kurdistanê tê diyar kirin û tê gotin ku ji bo xurtkirina yekîtiyê wê bi partî, rêxistinên siyasî û kadroyên sosyalîst re xebata yekîtiyê bê domandin. Li ser civaka ku YEKBÛN dixwaze jî di belavokê û programa wê de weha tê nivîsîn:

"Bidawîanîna serdestiya ekonomîk, polîtîk, leşkerî ya kolonyalîst, emperyalîst û hêzên wan ên serdest yên li Kurdistanê, bi şoreşa netewî û demokratîk û danîna cumhuriyeteke serbixwe, demokratîk li gorî sîstema parlamentarîzma pîrpartîti".

"Piştî wê bi beşdariya muştê-

rek a hemû mirovên li Kurdistanê ku bi keda destê xwe dijîn, tîkoşîna peydakirina mercên sosyo-ekonomîk, polîtîk û zîhnî; yên ku civatê ber bi sosyalîzmê ve dibin, berdeyam be".

Di dawîya belavokê de jî YEKBÛN'ê gazî endam, dilxwaz û welatparêzên Kurd dike; "Pîrs-girêkên li ser hatin peyivîn, bîrîyarên hatin girtin û perspektîfên ku di kongreya yekem a YEKBÛN'ê de ku hêz û qerardariya xwe ji çîna karker û gelê rênçber ê Kurdistanê digre, me dane pêş xwe, di tîkoşîna rizgariya netewî û civakî ya Kurdistanê de gavine yekîtiyê û nûvejîne ne. Kongreya me, wezîfe û berpirsiyariyên giran dan ser milên endamên Komîta Merkezî û tev endamên partiyê. Di rojên pêşiya me de garantiya encamên biryar û perspektîfên me, bibirariya me ya tîkoşînê ye. Lewra ji bona yekîtiyê û nûvejînen pîrî serketin, agirê xebatê geş bikin.

Pêla cîneyetên qesas...

nê. Roja îniyê roja dawî ya dibistanê bû. Dema Seydo li ber deriyê hevalê xwe li benda wî disekine, ji pişt wî du kes tînin û 3 gulle yên demançê berra serê wî didin û jî ber çavan wenda dibin.

Seydo AYDOĞAN roja 26'ê Îlona 1963'an li bajarê Kızıltepe hatibû dinê. Xwendina xwe ya pêşî û navîn li wir temam kiribû. Piştî temamkirina enstîtuya mamostetiyê, li Adilcevazê mamostetî kir. Berî sal û nîvekê vegeriya bajarê xwe, li wir karê xwe yê mamostetiyê domand. Par havîne zewicî bû û berî kuştina wî bi hefteyekê re lawîkê çêbûbû.

Piştî bihistina xebera reş, li Kızıltepe dikandaran dikanên xwe girtin. Seet dor 12'ê nîvro bi beşdarbûna qerebalixek mezin cenazê wî defîn kirin. Lê dema ku qerebalix ji goristanê vegeriya esker û tîmên taybetî gel gullebaran kir. Li wir Abdurrahman URAL hat kuştin û hin kes birîndar bûn û gelek kes jî hat girtin.

Wekî ku tê zanîn ev serê salekê ye ku li hemû derê Kurdistanê bi taybetî kesên welatparêz yên ku tesîra wan di nav gel de hene û jî wan tê hezkirin yek bi yek tînin kuştin. Pêşî li Diyarbekirê Vedat AYDIN bû. Lê welê xuya ye ku şiklê kuştina Vedat nehat hesabê wan û nuha şiklêkî nû bi kar tînin, raste rast wan didin kuştin. Jixwe hemû tişt tevlihev bûye û jî her bûyerê re qulpek tê dîtin. Piraniya wan kuştinan bi navê Hizbullah tînin kirin, yan wer tê gotin. Di nav gel de

navê wan bûye Hizbil- kontra. Çi nav li qatilan dibe bila bibe, ya muhîm li pişt van bûyeran hêzên dewletê bi xwe hene.

Van hêzên cîneyetan jî xwe re bajarêkî hildibijêrin û li wir dest bi kuştina welatparêzan dikin. Di destpêkê de hedef Cizîr û Nisêbîn bû, piştê Farqîn, Kızıltepe û Batman, dûre Diyarbekir û Wan.

Tenê li Kızıltepe Seydo AYDOĞAN yê 13'an bû ku hat kuştin. Ji van tenê qesasên yekî dikandar ku navê wî Cemil ASLAN e jî aliyê xelkê hatin girtin. Ev herdu qatî Abdullah KARAN jî Mazîdaxê û yê din Lokman IDİL jî Cizîrê ye, nuha li hepsa Kızıltepe girtîne. Ji xwe yê 14' an li cenaze hat kuştin. Dûre heta 14'ê meha Hiziranê 4 kesên din jî hatin kuştin. Ji van du kes birayê hev bûn û pîsmamê Edip İBRAHİMOĞLU ne, ku ew jî berî demekê cardin li Kızıltepe jî aliyê kesên nenas ve hatibû kuştin. Berî Seydo bi demekê mamosteyekî din bi navê Seyfettin AYDIN jî Nisêbînê cardin li Kızıltepe hatibû kuştin. Du kesên ku di 14'ê Hiziranê de li ser riya gundekî hatin kuştin, tê gotin ku hevalbendên Hizbullah bûn. Bi kurtî li Kızıltepe di nava 3-4 mehan de 18 kes hatine kuştin, lê tenê qesasên yekî diyar in.

Roja 8'ê Hiziranê vî carê li Diyarbekirê nûçegihanê rojname "Özgür Gündem" Hafîz AKDEMİR serê sibê dema ku jî malê diçû karê xwe bi rê ve diya wek her car jî aliyê kesên nenas

ve hat kuştin. H.AKDEMİR rojnamevanê çaran e ku isal hatiye kuştin. Rojnamevanê yekemîn berpirsiyarê kovara "2000 e Doğru" yê Diyarbekirê bû ku roja 18'ê Sibate li buroya xwe hat kuştin. Piştî wî nûçegihanê rojname "Yeni Ülke" Cengiz ALTUN li Batmanê roja 24'ê Sibate li nav bajêr hat kuştin. Rojnamevanê sêyemîn İzzet KEZER bû ku roja Newrozê li Cizîrê jî aliyê hêzên dewletê ve hat kuştin. Kuştina rojnamevanan nişan dide ku hêzên dewletê naxwazên bûyerên li Kurdistanê diqewimin bînin.

Her weha li Farqînê jî kuştinên bi vî rengî her berdeyam in. Roja 10'ê Hiziranê Dr. M. Emin AYHAN, 14'ê Hiziranê Nihat KURKAN û M. Emin ÜLKÜ hatin kuştin. Li Batmanê İbrahim DEMİRHAN roja 9'ê, endamê komîta birêvebir ya Komela Mafên Insanî liqê Batmanê û HEP(Partiya Ked a Gel)ê Siddîk TAN jî roja 20'ê Hiziranê hatin kuştin. Ji van cîneyetan yek jî qesasên wan nayên zanîn. Tenê di nav herdu mehên Gulan û Heziranê de hejmarê van "cîneyetên meçhûl" 86 in. Û hejmar her ku diçe zêdetir dibe.

Lê li alî din gelek kes jî wînda ne ku kes bi aqîbeta wan nizane. Li gor daxuyaniya rêxistina HEP'ê ya Sêwregê di nav hefteyekê de li nav sînorên bajêr 3 termên nenas(mechûl) hatine dîtin.

Wiha bûye ku li gelek bajarên Kurdistanê piştî dinya tarî dibe, kes nawêre derkeve derva, her kes jî xwe ditirse û kes nizane wê kînga û jî aliyê kê ve bê kuştin.

<p>Armanç Rojname Kurdî ya mehane Monthly Kurdish Magazine Redaksiyon: M. Elî Zinarê Xamo Hesen Mizgin Mîrza Bextiyar Lewend Firat S. Rêving M. Lewendî Redaktorê berpirsiyar: M. Elî Berpirsiyarê beşê Dimîlkî: Malmîsanîj</p>	<p>Adres : Box: 152 16 161 15 Bromma Sweden Telefon 46-8-803135 Telefax: 46-8-801825 Ansvarigtgivare: Kurdiska Demokratiska Arbetar Unionen Postgiro: 50 37 99-9 ISSN: 0348 7385</p>	<p>Abonetî Prenumeration Abonetîya Salekê Li Skandinaviya 150 SKR Maqam Myndigheter 250 SKR Li Ewropa 50 DM Li derveyî Ewropa 40 \$ Anons/ilan niv rûpel/ en halvsidan 2500 SKR</p>
---	--	---

QANÛNA HILBIJARTINA SEROKÊ TEVGERA RIZGARÎXWAZ A KURDISTANÊ

Ji bo berjewendiyên gelê Kurdistanê Iraqê, serokatiya politîk ya Cebheya Kurdistanê Iraqê, qanûna li jêr derxistîye.

QANÛN nr. 2

Qanûna hilbijartina serokê/a tevgera rizgarîxwaz a Kurdistanê

BEŞA YEKEM

Bendên Giştî

Bend 1: Gelê Kurdistanê Iraqê bi hilbijartinên rasterast, giştî û bi dengdana nihênî serokê/a tevgera rizgarîxwaz a netewî hildibijêre ku ew dikare bi navê gel bipeyve, li hundir û li derve temsîla wî bike.

Bend 2: Dema wezîfeya serok 4 sal e.

Bend 3: Hilbijartina serok, di eynî roja hilbijartinên Meclisa Netewî de û li gor bendên birê heftem ê Qanûna Hilbijartina Meclisa Netewî a Kurdistanê Iraqê tê çêkirin. Dengdan, hejmartina dengên û îlana encaman li gor bendên vê qanûnê tenê çêkirin.

Bend 4: Meclisa Netewî, me'aşê serok bi qanûnan dest nîşan dike.

BEŞA DUYEM

Mercên hilbijartin û hatinhibijartinê:

Bend 5: Mercên namzetiyê:
a- Divê namzet 40 saliya xwe tijî kiribe
b- Divê hevvelatîyê/a Kurdistanê Iraqê be û li wir bijî
c- Divê bikaribe mafên xwe yê medenî û siyasî bi kar bîne.

Bend 6: Ji bo hilbijêran bendên 19 û 20 yê Qanûna Hilbijartina Meclisa Netewî derbas dibe.

BEŞA SIYEM

Bend 7:
a- Muraceata namzetiyê, berî roja hilbijartinê bi kêmanî 15 rojan ji bo Komîteya Bilind a Hilbijartinê ya ku ji bo hilbijartinên Meclisa Netewî hatiye danîn, tê kirin.
b- Komîteya Bilind a Hilbijartinê di nav du rojan de li ser mur-

raceata namzetiyê biryarê dide.
c- Mafê namzet heye ku di nav du rojan de li ba Mehkemeya Îstînaf Îtirazî biryara Komîteya Bilind a Hilbijartinê bike.

ç- Mehkemeya Îstînaf di nav du rojan de li ser îfrazê biryara dawî dide. Roja ku biryara mehkemê tê îlan kirin, namzet ji biryarê agahdar tê hesabandin.

d- Komîteya Bilind a Hilbijartinê bi kêmanî 7 rojan berî hilbijartinê navên namzetan îlan dike.

Bend 8: Namzetê/a ku piraniya mutleq digre, tê hilbijartin. Eger kes ji namzetan piraniya mutleq a dengên negre, piştî 15 rojan car din hilbijartin çêdibin. Du namzetên ku dengên herî zêde girtine beşdarî vê hilbijartinê dibin. Kî ji wan dengên zêde bigre, tê hilbijartin.

BEŞA ÇAREM

Wezîfe û sehiyatên serok:

Bend 9: Serok berî ku dest bi wezîfa xwe bike, li pêş Meclisa Netewî a Kurdistanê sonda li jêr dixwe: " Bi navê Xwedayê mezin sond dixwim ku ez ê yekitiya erd û gelê Kurdistanê Iraqê biparêzim, rêzên hêzên netewî bi hêz xim, siyaneta qanûn û rejîma demokratîk bigrim, di nav hevvelatîyan de ferqiyê nakim, mafên gel biparêzim û li gor destnîşankirina Meclisa Netewî a Kurdistanê bi hukûmeta merkezî re peywendîyan bimeşnim."

A-

Peywendiyên serok di gel Organa Qanûnda-nînê:

Bend 10:
a- Serok, Meclisa Netewî a Kurdistanê, gazî celseyên normal, yan awarte dike.
b- Îttifaqên ku Meclisa Netewî li ser biryar daye, erê (tesdîq) dike.
c- Qanûn û nizamnameyên ku Meclisa Netewî li ser biryar daye, erê dike.
ç- Dema Meclis di tetilê de ye, yan di rewşên awarte de biryarnameyên di hukmê qanûnê de derdixe. Eger meclis bicive, divê ev biryarname ji aliyê Meclisê ve bîn erêkirin.
d- Muswedeyên qanûnan pêşni-

yar dike.

e- Ger dema wezîfeya Meclisê bi dawî hat, yan Meclis hat feshkirin, serok li gor qanûnê di nav 15 rojan de ji bo hilbijartina Meclisa Netewî gaziyekê derdixe.

B-

Peywendiyên serok di gel Organa Birêvebirinê:
Bend 11:

a- Emrê danîna organa birêvebirinê derdixe, dide kesê ku ji aliyê Meclisa Netewî a Kurdistanê ve ji bo danîna organa birêvebirinê hatiye dest nîşan kirin.

b- Piştî ku Meclisa Netewî baweriya xwe dide Organa Birêvebirinê, serok vê organê erê (tesdîq) dike.

c- Li ser daxwaza aliyê elaqedar, emrê tayîn, jikarderxistin, yan îstîfayên memuran dide.

ç- Şewirmendên xwe hildibijêre û tayîn dike.

d- Cezayên îdamê qebûl dike, yan sivik dike.

e- Di gel Organa Birêvebirinê politîkaya giştî a Kurdistanê Iraqê dest nîşan dike.

Bend 12: Fermandarê giştî yê tev hêzên çekdar ên hevgerî yê li Kurdistanê Iraqê ye.

BEŞA PÛNCEM

Bendên Cihê

Bend 13: Ji ber çî sedem be, bila bibe, dema serok ne amade be, serokê-a Organa Birêvebirinê cihê wî digre.

Bend 14: Dema meqamê serokiyê vala bibe, ji roja ku vala bibe, di nav du mehan de heta ku serokê nû tê hilbijartin, serokê/a Meclisê wezîfa serok digre.

Bend 15: Mezintirîn merciyê muhakemê, biryarê li ser îfrazê encama hilbijartinê dide. Biryara wê biryara dawî ye.

Bend 16: Ev qanûn ji roja ku di rojnameya Cebhê de tê weşandin, derbas dibe.

Serokatiya Politîk
Cebheya Kurdistanê Iraqê

NEZMÎK

Nimûneya civaka me ya rêxistî Cepha Kurdistanê Iraqê

Vîldan Tanrikulu

Pirsa rêxistinê di nav tevgera neteweyî demokratîk ya li Kurdistanê Bakûr û her wisa di nav ronakbîrên vî beşê welatê me de ji gelek aliyên ve di rojeva têkoşinê de hin jî cihê yekem digire. Min gotina "ji gelek aliyên ve" bi kar anî, ji ber ku ev pirs çî ji aliyê naveroka xwe ve çî jî ji aliyê şikil ve di rojevê de ye. Ev pirs ne ji ber tunebûna rêxistinê ve di rojevê de ye. Rêxistin pir in, hejmara wan jî dehan zêdetir e. Lê her kes welê xuya ye ku ji ya xwe ne razî ye, lê yê din jî naecibîne. Lewra jî dema pirsê rêxistinê dibe babetê gotûbêjek, gotina rêxistin li gel rengderên "nuh", "freh", "kutlewî", "neteweyî" ûwd. tên bikaranîn. Gotina rêxistin pîri caran şûna "partî" yê tê bikaranîn. Yan jî bedêla gotina rêxistin dibe "rêxistineke siyasî"

Eşkere ye ku ji gelê Kurd re rêxistin (ne rêxistinek tenê) pêwîst in. Ji bona ku mafên neteweyî û demokratîk bîn bi dest xistin, divê rêxistiniya civata Kurd xwedî iskeletekê be. Ev iskelet jî birêxistinbûnek siyasî ye. Awayên din yê birêxistinbûnê jî li dor vê iskeletê laşekî bi ruh û kamil derdixe holê. Di her warê jiyandê de bi her şiklên pêwîst birêxistinbûnek di sewiya neteweyî de şertekî esasî ye serketinê ye. Sewiya neteweyîbûn, aliyek jî qereqera birêxistinbûnê ye. Aliyekî din jî, wekî her civatên din, em Kurd û civata me jî xwedî berjewendî û bir û rayên cuda ne. Xwedî helwest û armancên cuda ne. Ev cudabûn jî aliyekî din yê qereqera sewiya birêxistinbûnê nîşan dike ku ev alî jî aliyê civakî ye.

Tiştê pêwîst ew e ku em bikaribin vê pîralîbûna civata xwe ne tenê bi gotin, lê her wisa bi helwestên xwe yê pratîk jî fam bikin. Bi koordînasyon û hevkarî bikaribin aliyên cuda yê civatê, berjewendiyên cuda yê civatê di berjewendiyên sewiya neteweyî de binim cem hev. Fonksiyona tu tiştî biçûk nebînin, lê fonksiyonên her aliyekî civatê û her şiklê rêxistin, zebat û têkoşinê di cihê xwe de bibînin û bi kar binin.

Her çend pêwîstiya civata me di warê birêxistinbûnê de hewqas fireh e jî, ya herî girîng û ya ku di rojeva têkoşinê de ye, "rêxistineke siyasî" ye. Bêyî ku ditînin di vî warî de hene, bînim rojevê dixwazim bala xwe bidin rewşa Kurdistanê Başûr. Ji vê beşa welatê xwe hin tecrûbeyan derxin.

Cepha Kurdistanê Iraqê ji gelek partiyên cuda pêk tê. Li ser naveroka xebata cephe û şiklê xebata rêxistinî yê cephe gelek rexne û ditînin heta nuha hatine holê. Piraniya van ditînan jî ew bû ku, Cepha Kurdistanê Iraqê di mana xwe ya esasî de wekî cephe nikaribûye bixebite. Mumkune ev ditînin bi tevahî rast be. Lê iro rastiyek din jî li ber çavan e. Bîngehê pêşveçûna ku iro her Kurdekî welatparêz pê kêfxweş e, bi her kêmanî û xeletiyên xwe ve hebûna Cepha Kurdistanê Iraqê (CKI) ye. Û her wisa parastin û pêşxistina mewziyên bidestxistî jî her wisa bi hebûna CKI ve girêdayî ye. Bê guman CKI "rêxistineke siyasî" ye. Lê di nav CKI de 8 rêxistin-partiyên siyasî cih digrin. Bir û baweriyên cuda, berjewendiyên cuda yê civata Kurd li başûrê Kurdistanê di nav van rêxistinên cuda de hatine cem hev. Lê ev bir û bawerî û berjewendiyên cuda di sewiya neteweyî de gihîştine hev. Civata Kurd nexistine qalibekî. Bi vî awayî her aliyekî civatê di hebûna CKI de xwe dibîne, beşek berjewendî û armancên xwe dibîne. Bi vî awayî jî CKI dibe garantiya hebûn û pêşvebirina mewziyên bidestxistî.

Dema em bikaribin tecrûba çend salên dawî û ya iro yê xebata CKI baş tê bigihîn, dê di lêgerînên xwe yê li ser pirsê rêxistinî li bakûrê Kurdistanê de hin zelaltir û realisttir bibin. Cudabûnên di nav partiyên li başûrê Kurdistanê jî yê bakûrê Kurdistanê ne zêdetir in. Mumkun e kêmîtir jî nebin. PDK-I 1946'an de, partiyên din bi piranî di salên 70'yî de hatine avakirin. Partiyên me jî van kevintir jî nînin. **Partiyên ku %45 deng girtin û %1 deng girtin, hene û her yek xwedî fonksiyonekê ye. Partiyên ku xwedî stratejiya "Kurdistanê mezin" û "otonomî" ne, di nav CKI de cih digrin. Tecrûbeyek jî vê nûtir, nêzîktir û zelaltir em nikarin peyda bikin.**

Rewşa Fewqelade 4 mehên din dirêj bû

Rewşa Fewqelade ya li Kurdistanê Tirkîyê ye ji alî hukûmeta Demîrel û Inonu ve 4 mehên din hat dirêjkirin. Partiya ANAP û Refah beşdarî dengdanê nebûn, ji partiya SHP'ê 20 parlamenteran dengên "na" dan û bi vî hawî bi 222 dengên Rewşa Fewqelade 4 mehên din li Kurdistanê hat dirêj kirin.

Parlamenterên HEP'ê û hinek parlamenterên Kurd yê ji partiyên din li dijî dirêjkirinê deng dan.

Meclîsa Tirkîyê dema "Hêza Çakûç" dirêj kir

Meclîsa Tirkîyê bi 228 dengên erê mudeta wezîfa "Hêza Çakûç" 6 mehên din dirêj kir. Di dengdana 27'ê Hezîranê de 136 deng jî li dijî dirêjkirinê hat dayîn. Partiya ANAP û Refah dengdan protesto kirin. Ji parlamenterên HEP'ê (ku wexta dengdanê navê partiya wan OZEP bû) tenê parlamenterên Mûşê M. Emîn Sever û Muzaffer Demîr û yê Semsûrê Mahmut Kiliç dengê erê dan. Yê din jî beşdarî dengdanê nebûn.

Hukûmeta Iraqê ji bo ku hukûmeta Tirkîyê mudeta "Hêza Çakûç" dirêj kir, nerazîbûna xwe ji Tirkîyê re da diyar kirin. Mesûd Barzanî û Muhsîn Dizayî jî ji bo dirêjkirinê kêfxweşiya xwe ji hukûmeta Tirkîyê re nîşan dan.

Wek tê zanîn piştî şerê Xelîcê li dijî êrişên Seddam, Fransa, DYA û Îngîltere jî bo parastina Kurdan qewetek eskerî li herêmê bi cî kiribûn. Ji ber ku ev qewet di nav "sînorên" Tirkîyê de dimîne, meclîsa Tirkîyê sehiyet heye ku wezîfa vê hêzê dirêj bike, yan bi dawî bîne.

RAMANÊN RAMANWERAN

Dilê Kurdan li Hewlêrê lê dide

Lewend Firat

Piştî hilibjartinên giştî û avakirina hukûmeta milî rewşa Kurdistana Iraqê gihast qonaxek nuh. Cepha Kurdistani wezaretî da hêz û partiyên ku di hilibjartinan de % 7 deng negirtibûn û bi vî hawî carek din îspat kir ku çiqas li ser doza netewî û berjewendiyên welêt hesas û bi dîqet e. Herçiqas Partiya Sosyalîst û ya Gel wezaretî qebûl nekirine jî, lê di vî warî de Cephe wezîfa xwe aniye ci.

Bi vekirina Meclîsa Hewlêrê û avakirina hukûmetê re çî Îran, çî jî Tirkîye be di vî warî de niyetên xwe yê qirêj êşkere kirin. Rojnama *Tahrân Times* ku organa niv-ressmî ya *Wezaretê Derva ya Îranê* ye nivîsand ku, tiştên ku li Kurdistana Iraqê dibin, divê ku meriv li hember wan bêdeng nemîne û pêwîst e ku Îran, Tirkîye û Sûriye tavilê mudoheleyî vê rewşê bikin. *Wezaretê Derva ya Tirkîye* her çiqas wek Îraniyan êşkere negot jî, Xwedêgiravî bi "*ûslûbek Ewropî*" niyetên xwe weha diyar kirin; rewşa Iraqê ne mumkun e wiha dom bike, em naxwazin Iraq perçe bibe, ya herî baş ew e ku demokrasî û pîrtîti li seranserî Iraqê bi cî bibe."

Carna di dîrokê de momentên wisa ecayîb çêdibin ku aqilên merivan qebûl nake. Tevî ku Seddam îro dijminê Kurdan e jî, lê mana wî ya li ser hukûm di feydê Kurdan de ye. Ku ew di dema, yan jî piştî Şerê Xelîcê ji ser hukûm bihata xwarê, gelo wê rewşa Kurdistana Başûr îro wiha ba? Wê leşkerên Ewropî û Emerîkî bi navê "Hêza Çakûç" îro li herêma bûna? Yanî ger ev şertên navnetewî û izolebûna Seddam li dinê nebûna ne ew rewşa Kurdistana Iraqê weha dibû, ne jî çar dijminên kolonyalist wê xwediyên siyasetên xwe yê îro bûna. Li gel vê rewşa musaîd dijmin dîsa rehet nasekine û tehamula wan jî Kurdistaneke wiha nispî azad re jî tune. Hewlêdana kuştina dostê Kurdan Danielle Mitterrand jî nîşan dide ku dijmin çiqas zalim û xeddar e. Bi hewlêdana kuştina Mitterrand carek din nerazîbûna xwe nîşan dan. Lê D. Mitterrand daxwaza wan di gewriya wan de hişt. Piştî bûyerê Mitterrand Xatûnê got ku; êrîşa li dijî wê, wê hîn xurttir dike û wê Fransa alîkariyê ji Kurdan re zêdetir bike.

Helbet dijmin dijmin e û ji destên wan bê, wê nehêlin Kurdistana rizgar bibe û gelê Kurd bigihe azadiya xwe. Lê ji rêxistinên me Kurdan re meriv çî bibêje? Di Cepha Kurdan de PKK seroktiya Kurdistana Iraqê

ji xwe re asteng dibine. Ew ne tenê li dijî wan e, her weha Barzanî û Talabanî xayîn û ajan îlan dike. Abdullah Ocalan di nivîsên xwe de dibêje; ji dijmin zêdetir emê dijminê wan bin.

Bi tenê bi van tiştan jî nasekinin bi navê "antî împeryalistî" li dijî "*Hêza Çakûç*" ku li dijî êrîşên Seddam li herêma bi cî bûne, jî derdikevin. Rast e îro PKK li Kurdistana li gor metoddên xwe şer dike, lê ev şerkirina wê, heq nade wê ku ew Kurdistana Iraqê hilweşîne û sitara hemû Kurdan ji navê rake.

Lê meriv ji tewirên parlamenterên HEP'ê re çî bibêje. Ew jî li ser şopa PKK'ê diçin û heta nuha di meclîsê de tiştê berbiçav nekirine. Tenê rojên xwe bi partî guhestinê derbas dikin. Di reydanê dirêjkirina mûdeta "*Hêza Çakûç*" de jî careke din xwe êşkere kirin ku ew berjewendiyên gelê Kurd naxwazin, lê siyaseta partiyek Kurd tenê diparêzin. Bi neçûna Meclîsê û reynedana dirêjkirina dema "*Hêza Çakûç*" wan ne *daxwazên gundiyên Şirnexê, ne daxwazên esnafên Diyarbekirê, ne jî daxwazên karkirên Batmanê anin ci.*

Di dîroka Kurdistana de ev firsada duyemîn e ketiye destên Kurdan ji ya dema Mahabadê munasibtir e. Dewletên wê demê ku piştigirîya Îranê kirin, Mahabad pelçiqandin, îro ew li dijî Seddam piştigirîya Kurdan dikin û bi fîlî leşkerên xwe li herêma bi cî kirine.

Îro vatinyên her hêzêke welatparêz û her Kurdekî welatparêz ew e ku piştigirîya madde û manewî ya Kurdistana Iraqê bike. Ev firsada tarîxî ku ketiye destê Kurdên Başûr bi alîkariya her Kurdekî divê bê parastin. Ger ku Kurdên perçên din û yê li Ewropayê alîkariya birayên xwe yê Başûr nekin, wê gavê wê çawa ew alîkarî û piştigirîyê ji xelk û dewletên din û nemaze ji yê Ewropayîyan bixwazin.

Ji aliyê din, divê meriv fahm bike ku serokên Kurdistana Iraqê çima hêviya xwe ji Tirkîye dikin. Tirkîye ji bo wan deriyê hêviyê ye û bi vî deriyê 4 milyon Kurd debara xwe ya rojane dikin. Ji xwe siyaset li ser şert û mercên konkret tê kirin û ev şert û mercên konkret li derveyê îrada Kurdan peyde bûne. Îro wezîfa herî girîng li pêş *Meslîs û Hukûmeta Hewlêrê* ew e ku welatê xwe li dijî êrîşên hundir û derve biparêzin, ji bo wê jî ordiyek nîzami pêwîst e. Ji aliyê din welatê xwe ji nuh ve ava bike, rewşa aramî, civakî û kulturî organîze bike û refaha xelkê xwe pêş ve bibe.

Stiriyên me

Lawikê Berrivanî

Hewcedariya min bi çend "dedektîvan" heye

Her du nivîsên min ên li ser "*nivîskarên dizek*" olanekê mezin da. Çi bi devkî û çî jî bi nivîskî be, her roj bi dehan kes ji ber vê lêkolîna min halana di min hil didin û min pîroz dikin. Heta nuha ji bo tu nivîseke min hewqas çepik nehatibû lê xistin. Vê qedirşînasiya xwendevanan ezê tu carî ji bir nekim... gelek sipas.

Lê bê guman nameyên ji min re tîn giş ne yê pesn û sipasdarîyê ne. Helbet ez ji diz û hevalbendên dizan jî hin "*xebernameyan*" distînim, ev jî tiştê tebiî ye. Ma qey ne ewê jî sipasî min bikin, bibêjin "welleh tu baş dikî!" Ji erd hetanî ezman heqê wan heye ku bixeyidin û gefa li min bixwin. Çimkî ez pûrê wan derdixim.

Xwendevanên hêja, hûn dizanin bi guherandina dinyayê re norm û pîvanên civatê yê ehleqî jî hatine guherandin. Civata me êdî ne civata berê ye, tiştê do şerm bû û meriv ji ber fedî dikir îro normal tê dîtin. Berê gava yekî diziyek bikira û bihata girtin feqîro perîşan dibû, rû pêre nedima ku biçiya nav mîlet.

Lê nuha rewş belovaciya wê ye. Bila derneketina nav gel li wir bimîne, tew bêtir meşûr dibe, di nav heval û hogirên xwe de qedr û qîmeta wî zêdetir dibe.

Wexta yekî di neqeba xwe de dizek bigirta, kesî jê re nedigot "tu neheq î, te çima girti ye!"

Lê nuha tîn bi gewriya meriv digrin, dibêjin, "ma ne şerm e tu tiştên wiha dinivîsin? Nivîsên ji serê salan ve ne di quncik muncikan de mane û hatine ji bîrkirin bi saya serê van camêran derdikevên ronahiyê û xelk jî xwe re wan dixwîne. Îcar wan ev nivîs nivîsandine ya jî jî xwe re ji derekê peyda kirine pîr ne muhîm e. Ya muhîm xizmet e xizmet..."

Yanî tu namîne ku ji min re bibêjin, divê tu herî "*uzrê*" xwe ji dizan bixwazi. Lê ez bi xwe hîn ne bawer im ku ez karekî çewt dikim. Lema jî lêkolîna xwe bê nabên didomînin.

Gava min dest bi vê lêkolîna xwe kir, min qet texmîn nedikir ku wê "*nivîskarên (!)*" diz hewqas pîr bin. Ez bi xwe êdî hew pêre digihînim. Bûyer roj bi roj zêde dibin, ne mumkûn e ku ez bi tena serê xwe kanibim ji bin vî barî rabim. Ev kar jî qeweta şexsekî buhûriye, hewceyî ekîbeke profesyonel e. Çimkî ji dizan hinek kone bûne, zû bi zû xwe nadin dest. Di vî warî de ew jî "*teknîkeke*" pêşketî bi kar tînin, tu delîl li pey xwe nahêlin.

Herçî "*nivîskarên*" diz in meriv dikane wan bike du gurûb; *dizên cesûr û yê kone-qurnaz*. Yê cesûr pîr tembel in, di xwe re nabînin nivîsên ku didizin biguherînin, hema navên xwe li binî dinivîsin. Girtina van celeb dizan rehet e.

Dizên gurûba duduyan wek tîti pîr kone ne, zû bi zû nakevin dafikê. Nivîsên ku didizin hinekî li binê guhê hev dixin, dixin qalibekî din. Ev yek jî şopajotîne zahmet û delîlan jî qels dike. Girtina van celeb dizan zahmetir e. Lê ne bê îmkân e. Ezê ji dizê her gurûbekê numûneyekê bidim.

Biraderekî bi navê **D. Doğan**, di kovara "*Deng*" hejmar 4'an de xwedêgiravî li

ser Newrozê bi Tirkî nivîsek nivîsî ye. Lê ne ji dîr û ne jî ji nêzik tu tiştêkî wî di nivîsê de tune ye, nivîs ya Rohat e û berê di kovara "*Dengê Komkar*" di hejmara 40'î de hatiye weşandin. **D. Doğan** jî hemûyê nivîsê, bêyî guherandîneke mezin kiriye malê xwe û di kovara "*Deng*" de daye weşandin. Nivîs nêzî sê rûpelan e, ez li vir nikanim gişî bidim hember hev. Lê ji bo xwendevan jî bi çavên serî xwe bibînin li jêr ez perçakî biçûk pêşkêş dikim. Ev nimûne ji gurûba yekê ye.

"Newroz bayramının geniş bir şekilde ele alındığı ve Kürtlerin ortaya çıkışına bağlı olarak işlendiği ilk eser, Firdevsî'nin Şeyhname (Rohat, rastiya wê, Şehname nivîsî ye. L.B) adlı halk destanıdır. Bu değerli eser, M.S. 999 yılında yazıldı. Oldukça kapsamlı olan eserin ilk bölümünde Newroz olayı ve kahramanları bir bütün olarak ele alınıyor." (D. Doğan, *Deng* hej. 4, rûp. 57)

Eynî nivîs, binêre: (Rohat, *Dengê Komkar*, hej. 40, rûp. 8)

Ez werim ser numûna ji gurûba duduyan.

Di rojnama "*Azadî*" yê hejmara 1'ê de li ser Mestûre Xanimê nivîseke bi îmtiza **Xalid Lezgîn** heye. Lê bê guman nivîs ne ya wî ye, wî ji kovara "*Svensk Kurdisk Journal*" bi hawakî hosteyî dizî ye; helbet qet qala çavkaniya nivîsa xwe jî nekiriye. Nivîs lêkolîneke dirêj e, ji alî **E. I. Vasileva** ve bi Rûsî hatiye nivîsîn. **Annika Beckström** ew wergerandiye Swêdî. A nivîsa **X. Lezgîn** qopyeke kurt a vî nivîsê ye. Lê wî wek **D. Doğan** nivîsê bê guherandin negirtiye, di gelek ciyî de cumle serobîni hev kirine. Feqet li gel vî guherandinê jî nikanîbûye ji binde şopê li ser xwe wenda bike; cardin hin cumle wek hev marîe.

Nimûneyek kurt:

"Bland kurdiska poeter och historiker från artonhundratalets förre hälft är Mah Sharaf Khanim Kurdistani sårskilt intressant. Hon skrev under pseudonymen Masture och var så vitt man vet den enda kvinnliga historikern i Främre och Mellersta Östern under denna tid.

Kärleken är Masturas dominerande tema." *Svensk Kurdisk Journal*, Nr. 15-16, 1989, rûp. 5.

"Di nav şair û hozanên sedsala 19'an de Mestûre cihekî taybetî digre. Bi qasî ku tê zanîn di wê dewranê da li hemû Rohilata Navîn da wek jin Mestûre yekane kes e ku dîrok nivîsî ye.

Di helbestên wê da tema seroke ev in e." (Xalid Lezgîn, *Azadî* 17-23.5.92 hej. 1, rûp. 9)

Cardin X. Lezgîn jî şiereke Mestûre Xanimê çend rêz wek numûne dane, ku ew jî wergera ya Swêdî ye. Yanî ne wergere ji Farisî ya jî ji Kurdiya Goranî ye.

Dizên di dataya (kompitor) min de helbet ne ev her du birader tenê ne, hîn gelek girre-girr jî hene û roj bi roj jî zêde dibin. Lema jî ez tenê pêre nagihêm, hewcedariya min bi çend "dedektîvan" heye. Ji çî siyasetê dibe bila bibe, çî îdeolojiyê diparêze bila biparêze her kes dikane muracaet bike. Şertên muracaetê ev in.

1- Kesê muracaet dike divê bi Kurdî, Swêdî û Tirkî bizanibe. Çimkî dizî bêtir ji van her sê zimanan dibe.

2- Zanîna Erebi, Farisî, Almanî, Îngilizî, Fransîzî û zimanên din ji bo "ketina kar" awantajêke baş e.

3- Dedektîfî ne belaş e. Heq, li gor diz û diziyê tê guhertin. Heger diz nivîskarekî mezin (mesela endamê PEN'ê) be û dizî jî çirokek ya jî romanek bi temamî be, wê gavê xelat jî li gor wê zêde dibe.

Gerrek dîrokî li nav arşivan

Celîlê Celîl



Ji dîroka destpêka Tevgera Barzaniya

Di destpêka sedsala XX'an de Împaratoriya Osmanî hê hilneveşiya bû. Kurdîstana Başûr, ku paşê bi navê Kurdîstana Iraqê kete nava dîrokê, di bin hukumdariya Sultan da bû.

Kurdîstana Başûr ji wilayetên Mûsilê û Baxdayê pêk dihat. Kurdên van wîleyetan berî destpêkirina Şerê Cihanê yê Yekem bi fi-rehî tevî çerxa tevgera gel bûbûn. Kurdîstan bi temami dîkeliya: li Dêrsimê, Bitlîsê, Suleymaniyê, Amediyê û li ciyên din serhildana gel xurt dibû.

Li herêma Behdînanê serhildana Kurdan bi rengêkî taybetî bû. Tevger ne li ser bingeha eşayirî bû. Nerazîbûna Kurdan ji jiyana civakî, aborî ya giran di qasîlê diyanetê da hate pêçandinê, bîr û baweriya diyanetê di vê tevgerê da mîletperweriya nû xuliqand û bû bingeh, û di demeke kin de piraniya eşîrên Kurdan ên Başûrê Kurdîstanê ji bona ku azadiyê li dora xwe civand. Paşê ew tevger hewqasî xurt bû, ku bi navê Tevgera Barzaniyan kete nava dîrokê. Û wek em dibînin, ew, di bingeha tevgera Kurdên Iraqê da jîndariya xwe îro jî didomîne.

Belê, ev tevger ji destpêka xwe, ji destpêka sedsala XX. heta vê dema îroyîn di riyeke dirêj û dijwarê derbas bûye. Ev rê rîya evalusyonê bûye: ji serhildana herêmî û diyanetî bû serhildana netewî, azadî û demokrasîyê, bû sembola mîrxasiyê û pêşmergiyê.

Li ser azadîzwaz a tevgera Kurdên Iraqê gelek hatiye axaftin û nivîsandin. Zane, rojnameger û Kurdnas pirtûkên giranbaha diyarî merhela vê tevgerê ya cihê-cihê kirine, lê ji bo ku xuy û xeysiye-ta tevgera Barzaniyan baştir bê zanîn û bê vejandin, hêjaye bi kûrayê lêkolîn li ser despêka wê bîna amadekirin.

Mixabin ku destpêka Tevgera Barzaniyan hîn di bin perda tariyê da maye.

Wek em ji dokumanên arşivan pê dihesin, cara pêşîn li ser serhildana Barzaniyan a sala 1909'a di çarşiya dîrokê da tê axaftinê. Di meha novembara (çiriya paşîn) sala 1909'an de pozê eskerê Tirkan hate pelixandinê û bi şûn da veşeriyên. Ji wê demê şûn da bala hukumdarên Tirkiyayê, wafî û serokeskerên wê hema-hema ji wê herêma şorişgeriyê nehate birînê.

Serokê serhildana Barzaniyan yê pêşîn Ebdulselam Barzanî bû, birayê Mela Mustefa Barzanî yê navdar û dîrokî. Sal bi sal gava hêzên Turkiya Osmanî dihatine pêşiya Barzaniyan û dişikestî, ew nav û deng belayî nava gel dibû û piştevanên wê tevgerê hîn zêdetir dibûn û pêra jî berxwedan xurt dibû.


Tevgera Barzaniyan ji ber guhê siyasatgerên Îngîlêrê, Rûsyayê, Îranê û welatên din derbas nebû. Dewletên ku li hemberî Turkiya Osmanî siyaseta xwe li

Kurdîstanê dimeşandin, dixwestin zêde û bi hûrgilî bi ser xuy û xeysiye-tên vê tevgerê vebin û buyêrên ku di navbera hukumetê û Kurdên "Şêxê Barzanê" de diqewimîn, bizanibin. Balyoz û konsolosên van dewletan li ser hemû bûyeran yeko-yeko ji dewletên

dest me da hene, me hîlbijartine û bi werger em wan diyarî xwendevanan dikin.

1. Rapora qonsulê Rûsya Qeyserî ya bajarê Bexdayê li ser civandina eskerê korpûsa 12. li Rewanduzê, Akrê û Amediyê.

Bexda, 3'ê Adarê, sala 1914, N. 101



Nimûna dokumenta arşivê ya bi Rûsî

xwe ra rapor dinivîsîn. Her çend eskerê Tirkan zora Barzaniyan dibirin, Kurd zêde li dorberê xwe dirihêrîn û dixwestin feyde ji alîkariya dewletên ku li dijî Tirkiyayê siyasat dimeşandin, ji xwe ra bibînin. Ji bo vê, serokên Tevgera Barzaniyan ketin çerxa siyasatê û dayin standînen xwe bi nûnerên dewletan ra xurt kirin. Berî destpêkirina

Şerê Cihanê yê Yekem qonsul û siyasatgerên Rûsyayê peywendiyên xwe bi Şêx Ebdulselam Barzanî ra girêdan. Hukumeta Tirkiyayê berî ku şer li dijî Rûsyayê dest pê bike, eskerê xwe bi xurtî avêt ser Kurdan, da ku serhildanên Kurdan li Dêrsimê, Bitlîsê, Barzanê di nava agir û xûnê da kafkûn bike. Şêx Ebdulselam Barzanî piştî şikestina hêzên Kurdan yê şerka di meha Hezîrana sala 1914'an da xwe avête bextê nûnerên Rûsyayê li Îranê û xwe xilas kir.

Serokqumandariya eskerê Tirkiyê di mehên Sibata û Adara 1914'an de dest bi tivdîra êrişeke mezîna a ser Barzaniyan kirin. Li ser van haziriyên eskerî yê li dijî Kurdan, balyozê Rûsyayê yê li bajarê Bexdayê M. Popov raporên xwe yek li pey yekê dişande ji bo balyozê xwe yê paytextê Rûsyayê re. Di van raporên da em nêrinên qonsulan li ser bûyerên Kurdîstanê, analîza wan siyasatgeran a li ser tevgera Kurdan dibînin. Pêra jî em bi himberîhevkirina malumatên ên ku ji çavkaniyên cure-cure hildigirin, kronolojiya şerê di navbera hukumetê û eşîrên Kurdan de bi dîdema rast em didin ber çavan.

Ji jêr du raporên qonsulê Rûsyayê yê li Bexdayê M. Popov ji nava gelek dokumentên ku di

Ji min ra hurmet e ku ji dêpartamênta pêşîn ra bêjim, ku di 3'yê vê Adarê de di bin N 100 de min ji balyozxana Rûsya Qeyseriyê ya li Konstantînopolê ra li ser van tiştan nivîsiye:

Li ser telgrafa xwe ya sîrfî ya 3'yê vê Adarê ya N 3. ji we ra bi hurmetgirtin wek serdezêdekîrinê dinivîsim:

Di meha Sibata buhurî da li vir li ser fermana Wezaretê Eskerî ji bo destpêkirina civandina eskerê korpûsa 12'an li Rewanduzê, Akrê û Amediyê (wilayeta Musilê) galgalalek bela bû.

Ev galgal rast derket, çimkî wek xuya bû di nava meha buhurî da 130 esker ji alaya siwarî ya 35'an bi 4 topên çiyayî ji Kerkûkê ber bi Rewanduzê liviyân û 100 esker ji tabûra 3'an a alaya 104'an ji Mûsilê ber bi Amediyê şandin. 12 Sibata tabûrên 1 û 2 yê alaya 104'an li ser hev 300 esker bi 2 topên çiyayî ya di bin serokatiya bînaşî Feyzî Efendî da ji Musilê ber bi Akrê rê ketin. Û di 18'ê Sibata de para alaya siwarî ya 35'an ku di ciyê xwe da mabû, ber bi KoySencaqê meşiya.

Li gor malumatên nû, ku di 20'ê Sibata de ji Kerkûkê gihîştine destê me, meşa esker ji Mûsilê û ji dorbera wê ber bi herêmên ku hatin bi navkirinê dom dîke.

Armanca Tirkan ji civandina eskerên korpûsa 12'a li Rewanduzê, Akrê û Amediyê, ew pêkanîna emeliyata li hember Şêxê Kurdan ê Barzanê ye, ku hukumeta merkezî bi daxwaza weliyê Mûsilê Sulêyman Nazîf Bey, destpê kiriye.

Şêxê Barzanê li gundekî li dorbera Akrê dimîne û serokê eşîreke

Kurdan hesab nabe, çimkî ew bi xwe merivekî ruhanî ye. Lê peyçuyên wî -mirîd- gelek hene û tesîra wî li ser eşîrên Kurdan ên parçê wilayeta Musilê pir mezin e.

Şêxê Barzanê otorîta hukumetê li ser xwe qebûl nake û ji ber wê jî ji zû va ye ku wî "asî" dihesibînin, yanî kesê ku li hemberî dewletê rabûye. Lê mirîdên wî tim êrişê dibin ser gundan, karwanan û gelek caran bi gurûpên eskerên Tirkan yê ku diçin pêşiya wî, şerê giran kirine. Xêna wê, niha em Şêxê Barzanê qaymaqamê Tirkan ê berê Safvet Bey, dijminê Unîonîstan* hêwiriye, yê ku piştî kuştina Nazîm Paşê ji Konstantînopolê rasterast revîbû cem Şêx. Anîha biryara kuştina wî derxistine (serê wî 200 lire qîmet kirine).

afvet Bey hîn, katê ku Nazîm Paşa waliyê Bexdayê bû û ew jî piştigirê Nazîm Paşa bû, gava li ser navê paşê hate hinartinê ba Şêxê Barzanê ji bo ku nakokîya wê demê di navbera Şêx û hukumetê da çêbibû hel ke, wî û Şêxê Barzanê hevdu naskiribûn.

Li gor gotinên ku gihîştine destê min, ji her tabûrê dora 100-130 eskerê here pêçiriyayî û navsere ji bona emeliyatê wê bêne hîlbijartinê, lê yê xort wê li ciyê xwe bimînin. Bi vî hawayî heger korpûsa 12. bi giştî tevî emeliyatê bibe, li herêma Rewanduzê, Akrê û Amediyê wê zêdeyî 3 000 esker bicivin; pêra jî 18 tabûrên divîzyona 36'an di her yekê de 120 merî, dora du tabûr jî ji peyê "nîzamî": 250 merî di her yekê de; siwarî û top jî wê zêde bin. Gotin bela bûye li ser wê yekê ku pareke korpûsa 11. ji Wanê tedareka xwe dibîne ku tevî emeliyatê bibe û ihtiyat jî wê bêne civandinê. Heta vê gavê li ser rastiya van gotinan, her weha li ser despêka şer di navbera wan da li vir îsbatî nehatiye standîne.

Bêşik e her tenê ew, wekî weliyê Mûsilê Suleyman Nazîf Bey goftugo tevî hinek şêxên Kurdan yê ku otorîta Şêxê Barzanê li ser xwe nas nakin, ji bo ew jî tevî emeliyatê bibin, destpêkiriye. Bi saya diyariyên mezîna û sozên reng-rengî ewî qayiliya hinekan standiye, ku gava lazîmatî hebe ewê alî wî bikin. Wek nimûne yek ji wan Şêx Reşîd Begê ji Berwariyê, Dêcêlyayê ji dorbera Akrê û hinek şêxên Amediyê ne.

Ji ber ku heywanê barbir kêmin û komkirina wan jî gelekî dijwar e, civandina esker zêde dirêj dikşîne. Ev dijwarî ku hergav jî pêşiya eskeran radibe, xuya ye li ber korpûsa Bexdayê ya 13 jî heye, wek nimûne em bêjin ku meha Tîrmehê ya sala buhurî, ji bo ku tabûrêkê bi zexîra xwe va bişînin Sêmawîyê, deh roj lazîm bûn ji bona ku hinek qantîr û hesp peyda bikin. Qantîrçî û meriyên ku erebeçî bûn, ji tîrsa tivdareka şer, da ku heywanên wan ji bo xizmeta eskeriyê bi zorê ne-

bin, li başûrê wilayeta Musilê di-kin nekevin ber çavan. Ev e sebeb ku girêdana karwanan ber bi Kerkûkê û Rewanduzê awqasî giran bûye.

Gotina ku gihîşt vir, ya ku Xwedê giravî Şêxê Barzanê û Safvet Bey ji ber tîrsa emeliyatê bazdane Îranê, derew derket. Şêxê Barzanê xwast Şêx Tahayê bi nav û deng bike terefdarê xwe, lê ji wê yekê tişt derneket, çimkî deh meriyên ku wî ji bo goftugoyan şandibûn bal wî, ji pîrbûna berfê li çiyaran neghiştibûn cî. Gumana Şêxê Barzanê maye tenê li ser hêzên wî, ji ber vê jî bi çelengî ji bo berxwedanê tedareka xwe dibîne. Li gorî gotinên ku ji Kerkûkê hatine, ew bi alîkariya Safvet Bey Kurdên xwe hazîr dîke: wan hînî nîzamê dîke, çek kom dîke, fişek û xurek dide ser hev.

Tedareka Tirkan wiha mezin li wilayeta Mûsilê şikê pêşda tîne, wekî armanca emeliyatê tişteki mayîna e, lê girtina Şêxê Barzanê û Safvet Bey her tenê mane ye. Zabitên vir şikberiya xwe venaşêrin, li ser wê ku li hemberî şêx û hêzên wî, ku ji birrek Kurdên bêtêvdîr pêk hatiye, ne gerek bû hewqas eskerê nîzamî bihata civandin, hemû hêzên korpûsa 12'an li Rewanduzê, Akrê û Amediyê bihatana komkirin. Ray heye, wekî Tirkan dil heye ku hêzên korpûsa 12'an bicivînin nêzikî sînorê Îranê, gava eleqetî bi Rûsyayê re tîjî bibe, berî pêş rê û pêguyên ferz li dijî hêzên me yê Îranê bigrin.. Lê ew gotin, Xwedê giravî emeliyeta cezakîrinê li himberî Kurdên Şêxê Barzanê, yê ku serî li himberî dewletê bilind kirine, bi qest belav kirine, bi wê netê, ku guhdariyê ji ser armanca bingehîn bi dîr xîna.

Bi dîtina cîgirê qonsulê me yê Mûsilê, şewirdarê dîwanê Kürsanov, ku bala wî tim li ser van tedarekan û cîleqîna eskeran a li wilayeta Mûsilê hebû, fikra dawî bêbingeh nîne.

Bi gotina wî, ştaba sereke ya herêma Qafqasê, ku hay ji van tedarekan heye, bêtêref nesekîniye.

Li ser bûyerên nû û encaman ez dîsa zû bi zû ji we ra binivîsim.

Serekê Qonsulxanê General M. Popov

Arşiva Siyaseta Rûsyayê ya Der. Bingeha "Polîtarxîv 1913-1914", girêka 363, rûpelê 78-81

(*) Unîonîst ji Tirkên Cîwan re digotin, ku endamê Partiya "İttîhad ve Terakkî" bûn.

Dûmahîk heye

Abdulreqîb Yûsif



Kêla gora Sultana keça Umer Şerîfî (?). Ji kêlên dataşkirî yê gorristana Cizîra Botan in û ji alî hunermend Feqî Mehemedê Guveşîlî hatiye çêkirin.



Beşek ji çavkaniyên hunerê wênekêşiyê li Kurdistanê vedigerin bo sedsala navîn û di kitêbên destnivîs de hene. Wek kitêba "El Xişaeş" û "Disqorids" ku Mihranê kurê Mensûrê kurê Mihran li bajarê Farqînê wêne kêşaye. Ew wêne yên niviyê yekem ê sedsala donzdehê ne û nîşanî me didin ku Mihran di nîgar-kêşana giya, mirov û cinawiran (heywanan) da xwedî destekî bilind bûye. Ev destnivîs, niha li namexana Îmam Riza ya bajarê Meşhedê ye. Îraniyan ji carekê zêdetir ew birine Awrûpa û di pêşengahên hunerên îslamî de berpêş kirine. Rojhatnasan jî wêneyên wan girtine û li ser wan nivîsîne...

Ibnul Rezazê Cizîrî di nivê duduyê sedsala donzdehan de navê xwe di vî hunerî de bilind kiriye. Girîngtir kitêba xwe li ser mesela "Endazeya Mekanîk"ê daniye. Wî bi xwe jî gotiye ku şarezayiya wî di mesela mekanîk û fizîkê de hebûye û gelek krokiyên cur bi cur ên wekî saetan keresteyên pişesaziyên dîtir kêşane. Ibnul Rezaz xelkê bajarê Cizîrê (Cizîra Botan) ye...

Hîmê wênekêşiya Bexdayê

Karên hunerî yên Cizîrî û Mihran bûne kevirên hîmê medresa (ekola) wênekêşiya Bexdayê.

Mehemedê kurê Osmanê Hesênkeyfî, şagirteki jîr ê Ibnul Rezaz û hunermendekî bikêrhatî bûye. Her wiha Muzafferê kurê Husênê Hesênkeyfî, mûsiqezan bûye û kitêba bi navê "Risale el Ekşaf fi ilm el Inxam" nivîsiye. Nimûneyek (kopiyek) vê kitêbê û ya Ibnul Rezaz li gel me heye. Orijinala yekê li Îstebolê di namexana Lalelî'yê û ya duduyan di namexana Ayasofya'yê de ye. Ev herdu hunermend jî xelkê bajarê Hesênkeyfê bûn ku dikeve navçeya Mêrdînê, ser ava Dicleyê. Muzaffer xwe bi navê "El Misûr" dide nasîn û kitêba xwe jî ji bo "El Melik el Adil" (melikê adil) Silêmanê kurê Xazî nivîsiye, ku mîrekî zana ye, Kurd bûye û bi qasî 50 salan li Hesênkeyfê fermanrewatî kiriye. Vî hunermendî di sala 827 ê koçî (hicrî) (1424-1425 Z.) de koça dawî kiriye.

Çendîn çavkaniyên dîtir ên hunerê wênekêşiyê li Kurdistanê hene, ku pêwîst e bîn komkirin, lêkolîn li ser wan bîn

kirin; ji bo ku xusûsiyetên hunerê Kurdewariya me di wan de bîn keşîfkin û bîn kirin bîngê hunerê Kurdî.

Kumbeta Laleş

Li hinek xanî û keviran wêneyên wiha hene, eger çî kêm in, li ser "geç" (alçî) hatine kolan. Wek ew çar wêneyên ku li

xaniyê Seyid Abdullah Axa (xaniyek e li Kela Hewlêrê) hene û ji alî Alî Ekber û Smaîl Sineyî hatine çêkirin. Wêneyê du reşmaran jî li Taxa Cuhûyan li Silêmaniyê li ser xaniyekî heye. 226 wêneyên bulbulan jî li nav nexşên gulîn ên Xilwetgeha Şêx Abdilrehman li Tewêle ne. Her wiha wêneyê marêkî li Laleşê li ser kumbeta

Şêx Adî û yek jî li Şêxanê li ser merqeda Şêx Mend e. Herçî wêneyên hilkolayî yên li ser kevir û şunwarên kevin in ku di van çend sedsalên dawîn de li Kurdistanê hatine çêkirin, ji wêneyên mirovan, jîndaran û tiştên dîtir ên wek nexşên giya, şûr, xencer û hemayîl in. Evên dawîn jî li ser kêleberên (kevirên) goristanan hene.

Di wê ger û girsîna bi qasî du mehan a sala 1977' an a li Kurdistanê Tirkiyê, me hinek karên ji vî awayî dît in û me rismên wan kêşan. Li Botan wêneyê mirovekî û segekî li ser Aşê Hamo ye ku ketiye aliyê çepê rûbarê Bînatê û nêzikî ciyê têkilbûna wê ya nav ava Dicleyê ye. Zilam, cil û bergên Kurdî, yanî şalûşepik lê ye. Wêne-



Kêleke hunerî li goristana Cizîra Botan. Ji alî hunermend Feqî Mehemedê Guveşîlî ve hatiye çêkirin.





Kêleke hunerî li goristana Cizîra Botan. Ji alî hunermend Feqî Mehemedê Guveşîlî ve hatiye çêkirin.



Kêla Saliha Xana keça Mehmûd Paşayê Baban ku sala 1240'ê koçî (1824-1825'ê Z.) koça dawî kiriye. Ev kêlebera ku bi nexş û nivîsinê hatiye hilkolan eserê hunermendê bertras(nihat) Îsmailê kurê Mehemedê Reşekani ye.

Her wiha kêlên Hesen Paşa û Osman Begê kurê Abdurrehman Paşa ji eserên vî bertiraşî ne û navê wî li ser hînekan e. Her wiha navê Mewlanê kurê Şêx Mehemed ku xetat û hunermend e, li ser Kêla Hebîbeyê keça Mehmûd e ku tarîxa 1236 li ser e. Kêla Ehmed Begê Mehmûd Paşa, rismê gul û teyran li ser hatiye kolan û bi boyax û murekeba rengûreng hatiye reng kirin. Kêlên van 11 gorên Babaniyan çavkaniyên hunerê bilind ên Kurdî ne.

yeke din li ser kêleke (kevîrê) goreka goristana Şêx Memo ya gundê Finikê ye, ku ev yek ji kevintirîn bajarên Kurdistanê bû û dikeve ser qeraxê rojhilatê çemê Dicleyê. Ev du wêneyên ku me behsa wan kirin gelek kevin in. Li sê cihên cuda yên navça Botan wêneyên hilkolayî hene ku yên kevin in.

Gora Mehemed Beg

Birek kêlên nexşdar ên girîng dikevin nav goristana bajarê Cizîrê, nav Camiya Mezin û sûrên bajêr, ku bi rastî gencînene birûmet a hunerê Kurdî ne. Wêneyên mar, dûpişk û çend cure xîşrên ji-

nan û merivan li ser wan kêlan hene. Mirov bi cilên Kurdî ne. Hinekên wan şahî û govendê digrin. Kevirê gora jinekê ya bi navê Sultanê ku di sala 1240'ê koçî (1824-1825'ê Z.) de miriye, wêneyê dergûşa (landika) zarokê li ser e. Goreka din, wêneya siwarekî li ser hatiye kolîn ku bi destekî şûr, bi destê dinê jî rimek girîtiye. Li rex wî jî wêneya tîfingekê û kêsekî barûdê û du eyloyên nêçîrê, du çivîk, şîş û çend lazimiyên tîfingê û qiloçên pezkovîyekê û tiştên dîtir li ser in. Wêneyên vê kêlê (vî kevîrî), nêçîrvanî û amancên dîtir diyar dikin. Em dûr nabînin ku ev gor ya Mehemed Begê kurê Mîr Şerefê mirê Botan be, ku sala 1207'ê

koçî (1792-1793 Z.) koça dawî kiribe. Delîlê me jî strana Nêriyê 'Efno ye. Çimkî Lavjê Pîr ê bavê nêçîrvan ku nêçîrvan û stranbêjê Mehemed Begê bûye, di vê stranê de şîna wî

Kêlên van 11 gorên Babaniyan çavkaniyên hunerê bilind ên Kurdî ne.

digre wiha diyar dike ku gora wî li goristana Cizîrê ye, wêneyên nêçîrvaniyê li ser hatine kolan. Ev kevîrên hanê, li gorî lêkolîna birayê ronakbîr û dilsozê kevne eserên Kurd Mela Xelefê Bafeyî, beşek in ji îşedestên hunermendê Bo-

tan; Feqî Mehemedê Guveşîlî.

Yanzdeh gorrên Babaniyan ku mezintirîna wan gora Abdurrahman Paşa ye, ew in li nav Mizgefta Mezin a Silêmaniyê ne û nexşên hin kêlan wêneyên çend balindeyan (teyran) li ser wan in. Li goristana gundê Zivinga Hacî Aliyan a li Botan, çend kêlên nexşdar hene. Ew kêl di Medresa Feqiyê Teyran (Finik) de jî hene. Dibe ku yên gorên çend mirên Finikê bin... Li gundê Hîzanê, ku bajarekî Kurdî yê berî zemanê Musilmanetiye û merkeza mîratiya Hîzanê bûye, û dikeve başûrê rojavayê Deryaçeya Wanê, çend kêlên hêja

yên bi vî babetî hene û roja 10.8.1977'an me wêneyên wan kêşan. Dibêjin ku gorek ji wan ya Sinemê ye. Ew jina ku strana wê heta herêma Koyê deng daye. Lê belê nivîsên wêneyên wan ên ku li cem me ne, baş nayên xwendin. Wêneyên simbilê genim li ser kêleberên navça Ranyayê tên dîtin. Ev jî ji wê hatiye ku Deştê Bitwêne, axeke bi xêrûbêr a zîreetê ye.

Ev nivîs ji kitêba "Bangewazêk bo Ronakbîranî Kurd" Abdulreqîb Yûsif 1985 çapxaneyî Kamîrani, Silêmanî, ji rûpelên 102 - 112 an hatiye wergirtin.



Kêla Abdulrehman Paşayê Baban (bilindiya wê 2 mîtro ye)

YEW BEYTA MİRİDANÊ ŞÊX SELAHEDDÎNÊ ŞÊX SE'ÎDÎ

Defter eşto destê serî.
La Ella, şîrîn Ella!

Defter eşto destê serî.
La Ella, dayîm Ella!

Ma rî keno be'sey pêxemberî.
La Ella, qirbon Ella!

Ma rî keno be'sey pêxemberî.
La Ella, heyron Ella!

La Ella, şîrîn Ella!
La Ella, qirbon Ella!

Şêxê mi şêxê key nûranî yo.
La Ella, qirbon Ella!

'Esley şêxê mi Pahliwî yo.
La Ella, qirbon Ella!

Terêqet Neqşîbendî ya.
La Ella, heyron Ella!

Dînê Muhemed hêşar biya.
La Ella, qirbon Ella!

Dînê Muhemed hêşar biya.
La Ella, qirbon Ella!

Mileta Kurd a pey şay biya
La Ella, raziq Ella!

La Ella, dayîm Ella!
La Ella, qayîm Ella!

Gelê Kirdo[n] rind bizonî!
La Ella, heyron Ella!

Axir wext, axir zemon o,
La Ella, heyron Ella!

Homay bido axret û îmono,
La Ella, qirbon Ella!

Ellah bido axret û îmono,
La Ella, dayîm Ella!

Homay kerdo qismetî Zazono
La Ella, qirbon Ella!

Ellay kerdo qismetî Zazono
La Ella, la Ella!

La Ella, şîrîn Ella!
Ellah, Ellah, dayîm Ellah!

Ellaw serî 'efê ma dono
La Ella, qirbon Ella!

Homay serî 'efê ma dono
La Ella, qirbon Ella!

La Ella, şîrîn Ella!
Elaaah! İmdat ya Muhemmed Mustefa!

Medet ya Bavê Siddîq! (6)
İmdat, medet ya Bavê Sido! (7)

(1)lek: 10. 000 (des hezari) ten. Tanî ferhengan gore, me'na na kelima, "100 000 (se hezar)" o.

(2)indad: imdad
(3)tûrn: torn
(4)Pîrecmon (Pirajmon): Yew dewa Pirani ya.

(5)menşur: namedar, meşhûr
(6)Siddîq (Sido): Lajê Şêx Selaheddîni yo.

(7)Na beytî yew miridê Şêx Selaheddîni vatibi, mi yew band (kaset) ra vengê yê gûşdarit û nuştî. Şêx Selaheddîn, lajê Şêx Se'îdî yo (Şêx Se'îdo ki 1925 di idarekerdoxanê Tirkîya, Diyarbekir di dar de kerd).

Çîrok

Govenda li ber mirinê

Bavê Nazê

Geya ku sal li gîska pezkûvî nezivîrî tu guhertin di jiyana wê de çênebû. Lê ku sal qulipî û buhar hat, ew bi xwe hesiya ku av di guhanên wê de digere. Bi vê yekê dilopên xwinê bi awayekî din niqutîn dilê wê û di damaran de geriyar. Cara ku ew dihingivî diya xwe jî, heyecan pê re çêdibû û laşê wê ji pêlên xweşiyê dilerizî. Êdî çavên wê li deveran digeriyan.

Dê dîna xwe da karika xwe, ku dilê wê dixurcile. Wê dizanî ku buhara temenê keça wê ye û çî dîr, çî nêzîk, ewê xwe bigihîne delalê dilê xwe. Dayê bi xîlafa adeta li çiyar, hefsar ji kezêba dilê xwe re berda û bi tenê bi awirên xwe qelewîziya wê kir. Wê li keça xwe dinêrî, fena ku bibêje: "Porkurê! Tu çî radipelikî xwe. Bîstîkek xweşî, hemberî çend mehên qirikaliyê ye".

Helbet dê bi tecrubên xwe dizanî, wê piştî hevdişînê çî bibe. Lê wê bi xwe jî êşa qolincên zayînê ji bîr dikir û bêyî dudilî xwe dispart nêriyê li gor dilê xwe. Belê ku pêlên qolincan bi ser de dihatin, dîsa hezar nifir li xwe dikirin û digot "Ev car, wê cara dawî be".

Belê tiştêkî diyar e, eger asteng jî têkevin pêşiya qanûnên jiyane, dibe ku hinekî bi derneqî bikevin, lê ewê her biçin serî...

Û her ku rojên buharê derbas dibûn, xweristê bêtir xemla xwe dikir, jiyar vedijênî û doza mafê xwe dikir. Xuya bû ku gîska pezkûvî nema dikarî xwe giro bike. Ji ber vê yekê, çilo keça çiyayî bi şev xwe ji malê vedidize û diçe ciwanê dilovanê xwe, yê ku wê, wê birevine, wilo gîskê xwe ji diya xwe vedidizî û bi serê kopên çiyar ket. Berî elindê, berê wê ket wî mexlûqê ku lê digeriya. Dilê wê bi xurtî lê da, çok lê şkestin û kete rewşek weha ku nema karîbû gavên xwe bavêje. Êdî diviyabû ew pê ve bihata. Ma kê dîtiye ku keç diçe ba xort? Çawa be, nabe ku ew şerma keçkaniyê ji bîr bike û xwe erzaz bi dest ve berde. Di vê bêhnîkê de li cihê xwe rawestiyayî ma. Serê xwe ber bi jor bilind kir û hilmek kûr û dirêj kişand.

Nêriyê pezkûvî jî bi firnikên xwe ba kişand û berê xwe da gîska bûk in. Bi vê yekê wê yekcar xwe winda kir... Tevizînokan laşê wê girt û daxwaza hevghîştî-nê pê re xurttir bû. Bêyî hemdê wê, qaçîka wê liviya û bi awakî mêşînî çend caran borîni pê ket.

Nêriyê zava xweş têgihîşt ku ew dibêje: "Wê min bistîne, tu li benda çiyî?!" Êdî fena ku ew di govendê de be, xwe ji latekî zerî latine din kir... Dawî çend gav man ku her du bigihên hev... û ...ji nişkê ve dengê teqîna tivîngan hat û olana wan li gelî vege-riya. Nêrî ji tîrsa cefilî û bi paş de çû... Lê cendêkê gîska ku hîn bi

miradê xwe şanebûyî, ji ser late hate xwarê. Kêlika ku kuşdarên wê li ser kelexê wê sekinîn, hê giyanê wê niqrîska dawî nedabû. Wê, bi çavên ku taya mirinê girtibû ser, li tebayên li dora xwe dinêrî. Jê xuya dibû, ku ew mexlûqên weha cara pêşî dibîne. Û dengê wan bi wê nexweş bû; dengê kirêt. Lê gava yekî xencer danî ser zengilokê, êdî wê nema bihîst; belê çavên wê tiştên herî şêrîn tê de, bi lom û gazin, her li cihekî dinêrin û dinêrin...

Bi xwe yek ji nêçîrvanan ev lom di awirên gîskê de dît û lewra jî bi gazin got:

-Tiştêk ji kuştin û mirinê pîstir tune ye!

-Diyar e tu bi ku de herî, tu dê dest ji Ewrûpiya xwe bernedî. Qey tu dixwazî ku pêşmerge tu cara bi goşt şa nebin? Nêçîrvanekî din lê vegeand û bê qerf gotin berdeyam kir:

-Ha min ji bîr kiribû ku tu endamê "Komela Parastina Heywanan" î. Ma çima Ewrûpî ji şûna heywanan rehetmetê li me nakin?

Nêçîrvanê bi temenê xwe yê herî mezin, awirên xwe li mirovê ku gotin dabû rûyê hevalê xwe, zewirand. Wî wilo lê nêrî, mîna ku bibêje: "Te çî daye ser piştê belengazê Ewrûpiyo, halê wî ne yê qerfê te ye". Ji bona ku xir û cir di navbera herdu hevalan de çênebe, nêçîrvanê kal, pirsî:

-Ez pê dizanim, zimanê te ji qama te dirêjtir e, hela Ehmedo de ka ji min re bêje, çima gîska pezkûvî bi hatina me ji cihê xwe nelivîya?

Bi rastî Apê Mihemed, çima ew ji cihê xwe nelivîya? Tê bîra min, carekê havînê me da ser piştê yekê, te digot qey bêxwediyê lingê dik xwaribû, ji cihekî diçû cihekî û me kir û nekir, me kêş li kuştina wê neanî...

-Te dît birako, ne bi derewa hatiye gotin ku nêçîrvan hene û nêçîrvanok hene, -Apê Mihemed got û pêre-pêre tonê gotina xwe guhert- heger bê henek... Li gora ku min bihîstiye gîska pezkûvî ji bo ku gonê wê bê, destê sibehê çavên xwe li Gelavêjê digerîne. Û dema wê dibîne, xwe winda dike. Di vê bîstîkê de, pêjna li hawîrdora xwe nake. Me jî di vê bîstîkê de hema dest bi dest ew girt.

-Na. Me ew kuşt, -merivê bi navê Ewrûpiyo bi awakî kovanî gotina nêçîrvanê mezin birî.

Ehmedo cardin xwe negirt û di rûyê wî de pişqî:

-Îca çî? Erê me ew kuşt...

Apê Mihemed bi xeyd li Ehmedo rabû, dîre li Ewrûpiyo zivirî û got:

-Seyda, guh mede gotinên vî barûtî. Û da ku bi yekcarî rê li ber gotinên zêde bigre, berê xwe da pêşmerge din û got:

-Hûn çî guh didin gotinên vala?!

Wexta me nemaye... Ya baş ew e hûn şaxekî bibirin... Ji bona ku em rahêjin gewdê gîskê...

Piştî van gotinan, êdî pêşmerge nema wexta xwe winda kir; nex di enîşka gîskê re derbas kirin, şaxê darê ji kelema şayîk kirin, di bin nex re bûrandin û bi

meşkiî rahiştin nêçîra xwe û bi rê ketin. Ewrûpiyo jî bi dilekî şikestî û xemgîn da pey wan.

Bi xwe êvara ku gîska pezkûvî şevder mabû, birrek ji pêşmerge berê xwe dabûn mexelê pezkûvî. Apê Mihemed seroktiya vî refî dikir. Li meqerê pêşmerge ew bi temenê xwe, yê herî mezin bû û bi tenê bi dilêma nêçîrvaniyê radibû. Dibê jî ber temenê û karê wî, ciyekî wî di nav pêşmergean de çêbûbû. Pîrî caran ew bi rê diket, dima heyirî ku kê bi xwe re bibe. Çimkî daxwaza çûnê gelek bû. Ji bo ku dilê kesî nehêle, bi dorê pêşmerge bi xwe re dibirin. Lê belê vê carê, ne li gora adeta xwe, wî bi xwe doz li Ewrûpiyo kir ku pê re bibe heval. Wî bi vê yekê xwest hinekî bêhna wî fireh bike. Çimkî berî heftiyekê Sebriyê Rêber yê ku Ewrûpiyo pîr jê hez dikir, şehîd bûbû.

Ew bêhteng bûbû û çî ji xwe re nedidît. Êdî bi her awayî hatibû guhertin. Ewrûpiyo di vê rewşê de bi çavên xemsar li Apê Mihemed nêrî, lê tevî vêha jî li ser çûnê, negot "na".

Ehmedo jî di nav qefla nêçîrvanan de bû û Apê Mihemed ew da alîkî û jê re got:

-Ez dizanim, tu bi zimanê xwe nikarî, lê ku tu gîrê xwe di Ewrûpiyo bidî, ji niha ve vegere. Ne serê min bêşîne û ne yê xwe...

Ehmedo yek ji wan pêşmergeyan bû ku ji Kurdên Ewrûpa nefret dikir û kengî gotin di hate ser wan, gotinên xwe dubare dikirin: "ez fam nakim, çima em rê ji van revokan re vedikin ku herin Ewrûpa? Ew direvin û di ser halan re em hurmetê ji wan re dikin. Bi rastî jî çima em hurmeta bizdonekan digrin? Hûn xala xwe nadin vê sosretê, ji cengê direvin û li wir (mebesta wî Ewrûpa bû) jî li ser navê me direyin!..

Di derheqê Kurdên Ewrûpayê de gotinên Ehmedo pîr bûn. Carna çarçewa gotinên wî fireh dibûn, lê her tim bi yek mebestê bûn; rûşkerîna wan. Û carekê pêla rojnamevanekî Kurd ku li Ewrûpayê dima, ji bo çend rojan hate nav pêşmergean, da hevpeyvî-nê bi wan re çêke û çend fotografan bikêşe, Ehmedo bi dîtîne re, bi nermî lê ne bêqerf jê pirsî:

-Yabo qurbano, tu dê çend rojan li nav me bimînî?

Yê rojnamevan bi dilekî xweş û fireh lê vegeand:

-Çend roj in û ez vedigerim... ma ne rojname li benda nûçeyên min e...

-Û millet? Merovê rojnamevan jê fam nekir, ji ber vê yekê pirsî:

-Çi millet? Ehmedo jî mebesta wî ji pirsê fam nekir û bi xwe ew berê li mahnayekê digeriya, êdî xezêba xwe lê barand û di rûyê wî de pişqî:

-Seyda hûn tu dipirsî kîjan millet? Ma çend milletên me hene?

-Bibuhure, te meqseda min fam nekir...

Ehmedo rê nedayê û got:

-Belê ezbenî, min meqseda te xweş fam kir. Hûn bûne Ewrûpî û mîna wan carna rehetmetê li me dikin û tene ziyareta me... Sibehî tu dê vegeerî û bi pozbilindî bibejî: "Ez li nik pêşmergean bûm". Ne dîr e tu dê sûretên xwe yên bi min re pêş delikên Ewrûpî bikî û bibêjî: "Binêrin demekê ez jî pêşmerge bûm". Seyda şerm e! Ma çermê rûyê we ji çî ye ku hûn ji ber xwe fedî nakin?!

Li vira pêşmergeyan bi wan re rûniştî bûn nema rê dane wî, ew ji mêvanan bi dîr xistin û ji rojnamevan daxwaza lêbûrinê kirin. Yê rojnamevan xwest bibêje: "Keko! Xebat ne tenê di şerê çekdarî de ye û xebata li Ewrûpayê, ne kêmi ya li vir e. "Û hîn bêtir wî dixwest felsefa xwe di vî warî de birijîne, lê nebûna Ehmedo, rê ji gotinê re nema vebû û ew bêdeng ma.

Bi xwe pêşmergeyan hevalên Ehmedo, bi cira wî ya nexweş li hember Kurdên Ewrûpî dizanibûn. Wan ev tişt dispartin çavnebariya wî. Wan digot: "Ew jî dixwaza here, lê ji payetî naçe û naxwaza ji qapaniya xwe dakeve..." Lê hinên din ne di vê nêrinê de bûn, wan digot: "Ji roja ku bab û birayê wî bi destên Beesiyar hatin kuştin, jî dinyayê xeyidî ye. Û di nêrina wî de kesê ne di şer de ye, xayîn e..."

Bi rastî jî, piştî bûyera kuştina bav û birayê Ehmedo, dilê wî hişk bûbû û gotinên wî jehrî bûn.

Û dema Ferhad ji Ewrûpayê hate nav pêşmergeyan, bi dîtina pêşî Ehmedo gotinên xwe tal dane rûyê wî jî û got:

-Ha Ewrûpiyo, tu jî hatiyî bi kincên pêşmergeyan çend sûretan bi me re bikşîni û herî pêş keçikan bikî ha?

Tevî ku Ferhad bi talbûna gotinên Ehmedo hesiya jî, bi dilpakî lê vegeand:

-Keko ez bi temametî hatime...

Ehmedo bi çavên matmayî û bêbawer lê nêrî û di nava xwe de got: "Ewrûpiyo, emê binêrin ka tu çawa bi temametî hatiyî!?"

Ji wê rojê û pê ve di nav pêşmergeyan de leqeba Ferhad bû Ewrûpiyo. Li gel vê leqeba pêkenîne û bêbawerîya Ehmedo bo gotinên Ferhad, bi rastî jî ew bi temametî ji Ewrûpayê hatibû. Bi xwe niyeta wî û vegeerê çêbû, piştî ku bo cara duyem agirê şoreşê li serê çiya pêketibû. Hingê wî hîn xwendina xwe ya rojnamevîniyê nebîribû serî, lê daxwaza çûna welêt li ba xurttir bû, pêla ku ew gotin ji devê hevlekî xwe yê karker bihîst: "Tu dizanî, îro ez pîr li ber mirovekî Kurd ketim. Hela ez ji bav û kalan kar dikim, lê ew? Kuro dibêjin ku ew li şoreşê, di nav pêşmergeyan de pîr bi qedir bû. Dibêjin heya nobetdarên wî hebûn. Û kêlika ew diçû destavê, çar kes pê re radibûn, ji bo ku hîmayeta wî bikin û mero-

vek misîn di destan de li bendî dima... Lê nuha?! Werin vê ecêbê, bi me re pisiya Ewrûpiyan davêje!"

Li ser van gotinan, Ferhad di nava xwe de got: "Gelo vî merovî fam nedikir ku çar kesa xwe jê re dikirin qurban? Heger çend kes ji yekî re dibin qurban, mana xwe ew ji wan re lazim e. gelo çima wî jiyana xwe ya bi rûmet bi vêya han guhert?" Dîre Ferhad ji hevalê xwe pirsî:

-Ev merov sebeba reva xwe dispêre çî?

-Ew dibêje, -hevalê wî bersiv da- ku ew dikare rênçberiyê bike, lê nikare destê xwe di nav şerê birakujiyê xîne.

Ev ne cara pêşî bû ku Ferhad hêcetên weha ji devên kesên ku ji welêt derdiketin, dibihîstin. Lê belê wî bawerî bi gotinên wan nedanî. Wî nedida rûyên wan merovan, lê ji xwe re digot: "Ev mahnek e, da bikaribin ji cengê birevin." Lê Ferhad xweş dizanî, heta ku ciyê wî Ewrûpa be, ewê nikaribe wê gotina xwe bide rûyê revokan. Dibe ji ber vê çendê wî biryara ku zû vegere welêt nav pêşmergeyan, stand. Û bi standina vê biryarê di nava xwe de got: "Riya reva ji welêt vebûye, û divê riya vegeerê jî vebe..."

Û ew vegeerîya. Roja gihîştina wî, çend merovên mîna ku biryara tevî şoreşê bibin, standibûn, li ser riya axa rizgarkirî gihîştin hev. Da ew bigihên meqerê liqê, pêşmergeyekî bi navê Sebro ji wan re bû rêber. Hema ku Ferhad bi rê ket, şûrê baweriyê weha pê re çêbû ku ew tu carî bi tiştêkî wilo nehesiyabû; piştî ewqas salên ji mişextiyê, ev cara pêşî bû ku ew li ser erdê devereke rizgarkirî ji axa welatê xwe dimeşîya. Ew bi xwe dihesiya ku lingên wî li ser erdekî hişk e; êdî ew ji piştê xwe rast bû û ji gelî û çiyayên xwe ewle bû. Jê di hate xuyakirin ku dar û devî dibêjin: "Em bi te re ne, bi riya xwe here." Û ew bi qînet, bi rêber û hevalan re diçû...

Sebroyê rêber, ji dîtina pêşî ciyê xwe di dilê Ferhad de hişt. Ew bi sivikayî diçû û bi devêkî bi ken dipeyivî û henek dikir. Bi vê yekê wî sawa tirsê ji dilên merovên ku nuh dihatin nav şoreşê, difirand. Ev aliyek bû, lê ji aliye din jî, wî bi gotinên xwe dixwest ew bi t'aba rê nehese. Wî ji tecruba xweş dizanî ku kesên nuh berê xwe didin nav pêşmergeyan, çavên wan li tirsê ye û laşên wan nikare xwe bi rehetî li ber meşa çiya bigrin. Her yekê ku bi Sebrî re dibû heval, ji bo rêberîya wî, di dilê xwe de sipasiya wî dikir. Ma kî ji pêşmergeyan kêfa xwe ji merovê ku ew fêrî gavavêtina pêşî di nav pêşmergeyan de kiriye, nayne?!

Diyar e xwînşirîniya rêber û sira bayê azadiyê welê kir ku Ferhad serxweş bibe. Di nivê rê de bi behana avrîştinê, xwe ji

hevalan veqetand û pasaporta xwe ya welatê Ewrûpî ku jê hatibû qetand, piçik piçik kir û dîr-dîr avêt. Bi vê yekê wî riya veqerê li ber xwe birrî û bi vê manê wî di ber xwe de got: "Mane kes bi mêvantî nayê welatê xwe... Merov li welatên xerîb dibe mêvan..."

Çaxa Ferhad pasaporta xwe qetand, heger kesê ew bidîta, bê guman wê jê re bigota: "Hovo, ma kes çiqê dara di bin xwe de dibire!? Çilo be, tu dê rojekê poşman bibî û tu dê hingê bi geza biçî tiliya xwe..."

Tiştêkî seyr e, lê Ferhad çiqasî eziyet di nav pêşmergan de xwar û êş û derd kişand, tu carî li ser hatina xwe poşman nebû. Tevî ku dijwariyên jiyana pêşmergatiyê, ne li gor bihîstina wî bû. Erê wî dizanî ku rewşa pêşmergan pirr çetin e û wî ji xwe re digot: "Gerek welê be, çimkî şerê bi dijmin re ne seyran e." Lê belê wî hiç nedizaniyê ku çetînî ji destên Kurdan bi xwe tê û ji ber lingên wan ranabin. Û ji roja pêşî tîna şewata agirê birakujiyê gihîştê wî. Êdî tiştê Ferhad ji xwe re fam kir ew bû ku şikandina piştî nezaniyê wî ne hêsan e...

Li gor plana ku Ferhad ji xwe re danibû, diviyabû ew jî wek her rojnamevanekî gotara li ser çalakî û qehramaniya pêşmergan binivîse. Û helbet ji bo vê yekê pêwîst bû car-car bi wan re bibe heval û here şer. Lê ji bextreşîya Ferhad, dema ew gihîşt meqerê Liqê, şerê di nav Kurdan de, yê xwe bi xwe gihîştibû pilpiloka herî bilind û îşkence nexweşîya wê dabû her deverê. Di wî heyamî de, şerê birakujiyê, mîna agirê bi pûş keve, xurt diçû. Û di ser halan re, geh ji vir û geh ji wir ba lê radibû. Ferhad li Ewrûpayê li ser vê yekê digot: "Gerek em herin û di nav hêzên xwe de bibin dengê xêrê: "Lê niha wî xwe bêhêz didît û kesî jî dengê wî nedibîr xwe. Heya Ehmedo da rûyê wî û got: "Ez dibêjim wan tu hinartiya nav me. Eger dilê te wiha bi wan diêşe, here nik wan. "Ferhad xwest jê re bibêje: "Ma hûn kî ne û ew kî ne, ma ne em tev kurên dayîkekê ne?!" Lê gotina xwe ji xwe re hişt û jê pêve bédeng ma. Û her, roj derbas bûn, ew bêtir diponijî, dilê wî ji dinyayê dişkest û bêhêvî dibû. Vêga wî ji xwe re digot: "Îca veqer min ji bo çi bû?" Vê dilsarbûna Ferhad wer kir ku qelama wî bimîçiqe û çavên wî bi awakî din li hawîrdorê binêrin. Êdî wî li pêşmergan dinêrî û di dilê xwe de digot: "Wek keriyê bêşivan, me daye ser riya bi talûke. Qey koranî bi çavên me de hatiye, em vê yekê nabînin! Yan jî..."

Di serê Ferhad de pirs pirr dibûn û gelek xaçerêk ji wan diçûn. Lê pirs birakujiyê û kêmalîkariya ji Kurdên li Ewrûpayê bûbûn ji pirsên sereke. Û li ser çûna Ewrûpayê wî ji xwe re digot: "Heqê Ehmedo heye... dtî-nên wî di cihê xwe de ne." Di wî warî de Ehmedo digot: "Ew bê-wijdan in, bi hezaran ji nav me derbas bûn û berê xwe dan Ewrûpayê. Niha jî piştî ku ciyên lingên xwe çêkirin. Rewşa welat ji bîr kirin û bi rehetî kêfa xwe dikin. Çilo xwarin di qirika wan de diçe xwarê? Çilo ew dikarin bi-

rayên xwe yên di talûkê de ji bîr bikin?!"

"Erê bi rastî heq di destê Ehmedo de heye ku gotinên ne xweş bide rûyê me". Ferhad ji baca nava xwe, di ber xwe de got û hate bîra wî, dema çend pêşmergên bîrîndar anîbûn meqer. Bîrîna yekî ji wan pirr giran bû, roviyên wî ketibûn ber wî. Hingê tixtorêk jî li meqer nebû. Wêga Ehmedo berê xwe da Ferhad û got:

-Li gora em dibihîsin, gelek tixtorên Kurd li Ewrûpayê hene, rast ew weha pirr in?

Mîna ku Ferhad xwe ji ber nehatina tixtoran gunehkar bibîne, bersiv da:

-Erê gelek in...

Ehmedo xwe negirt û berî gotin xilas bibe, peyivî:

-De bila Xwedê wan biqelîne! Ez dibêjim ew niha xwe ji her kesî Kurdîr dibînin?! Ne dîr e ew jî hêşîrên gumumokan li ser Kurd û Kurdistanê dibarînin, an na?

Ferhad bédeng ma. Ehmedo jî bîstekê rawestiyayî ma, paşê her bi tonê berê, gotina xwe berde-wam kir:

-Binivîse, ji wan re bide xuyakirin, ka em di çi rewşê de ne!.. Ji hemû Kurdên Ewrûpayê re bibêje, eger ew gepekê ji tamûtikên xwe kêmkî, û bi bihayê wan alîkariya me bikin, wê çavên me li ber deriyên xelkê negerin..."

Ferhad bê hemdê xwe, cara pêşî gotina xwe li hember Ehmedo got:

-Rast e, eger her Kurdekî li Ewrûpayê mehê carekê heqê pakê-tek cigare ji şoreşê re bike qurban û li vir jî em şerê hev nekin, emê bi ser Kevin.

Û ew cara pêşî bû ku Ehmedo li hember Ferhad dengê xwe nekir.

Erê du tiştan; şerê birakujî û kêmalakariyên Kurdên li Ewrûpayê Ferhad diêşand. Ji ber wan tebata wî nedihat. Lê belê çilo li Ewrûpayê nekarîbû rewşa giştî biguherîne, weha jî li vir nekarîbû berê tîvinga pêşmerga bide cihekî din. Ji xwe ev bêtirîtiya wî dibû sedem ku ew ji xebatê bê hêvî bibe û ji giyanê xwe nefretê bike.

Û gava xeber hat ku Sebriyê rêber bi tîvinga Kurdên li çeperê din hatiye kuştin, ji kirasê xwe derket û hêc bû: "Ma qewmek ji bilî Kurdan heye ku bi destê xwe mala xwe xirab dike û çira xwe vedimirîne?" Wî ev gotin bi qêrîniyê got û dîre hêdî hêdî fişîya, dapiçiya û kete qalîkê xwe. Îca bi saetan diponijî û xwe dîrî xelkê dikir. Rewşa wî ya nebaş ji hemûyan bêtir bala Apê Mihemedê neçîrvan kişand û doza ku pê re bê neçîrê jê kir. Ferhad pê re çû, lê piştî kuştina giska kûvî, li veqerê xwe ji wan vedizî. Hema ku çend sed metro kete nav wî û wan, bi bez, bi paşde reviya; qonaxekê çû, heta ku bi xwe hesiya ku bêhin lê diçike. Rawestiya û li hawîrdora xwe nêrî; bi tenê bi valahiyeke mezin hesiya. Êdî bi awakî bê armanc û bê mane dest bi meşê kir. Diçû, bêyî ku bizanibe bi kude û çima. Lê her ku bi wir de diçû, ew bi xwe ji xwe ditirsiya. Dinêrî ku hêzeke nehênî ya di hundirê wî de, zora wî dibe û berê wî dide riya çûn û nehatinê... Ji nişkêve peşkên baranê ketin. Vê yekê hinekî ew ji ramana ku pê dimeşîya, dîr xist û şiyar kir. Û kêlika ku baranê bi xurtî dest bi barîne kir, Ferhad di hundirê xwe de, xwe bêtir aza dît û bi

xwe hesiya ku hemû tiştên li dora wî, li vê deverê, yên wî ne; baran... zevî...çiya û ew bi xwe yê xwe ye. Bi van pêlên şîûrên bilind, ban kir. "Erdekî rizgarkirî, lê bê xwedî..." Wî çima welê got, bi xwe jî nedizaniyê û bi xwe jî li xwe veqerand: "Çima bê xwedî? Ma ez ne xwediyê wî me?" Piştî demekê dîsa ji xwe re got: "De bila xwediyên wekî min, li ser rûyê erdê nemînin!"

Lê barana bê etlahî rê nedayê ku bêtir noqî ramanên xwe bibe, çavên xwe li berqefekê, li rizdeyekê gerand ku xwe ji baranê biparêze. Dîr neçû, xwe zû zû avêt bin rizda latekî û rûnişt. Çawa serê xwe rakir, awirên wî, di nav dilopên baranê re, li kopên çiya ketin. Pêre-pêre wek rewrewkê, reşikê cendekê giska kûvî li ber çavên wî ji jor hate xwarê... Awirên wê... Erê ew awirên ku bi gazin lê dinêrin, niha di hişê xwe de li ber çavan didîtin... Dilê wî jî êşa hat guvaştin... Bi tenhayî û bê mane bi hebûna xwe hesiya. Ji dilekî peritî, gotinên bi lom ji nav lêvên wî xişikîn: "Ma çima wîlo?" Wî ev pirsî pîrî gazin jî kê dikir? "Ji xwe? Ji Xwedê? Yan jî..." Bi çavên mişt hêşîr li esmanan nêrî û bi dengê lîzokî got: "Yadê çima te ez anîm?... Kelegiriyê gotinên wî di qirîkê de hiştin. Wî xwe bi ser hev de anî, kabûkên xwe ber bi zikê xwe kişandin û ji dil giriya...

Baran rawestiyabû. Piştî kela girî, bêhna Ferhad hinekî hate ber... Bi giranî rabû ser xwe, bêyî dilê xwe çend gav avêtin, lê nizanîbû berê xwe bide ku. Pê hesiya, sedema ku ew ji hevalan veqetandibû dîsa bi xurtî di dilê wî de xurçilî... Diyar bû; biryara ku stendibû, bê veqer bû. Û ji nişkê ve mîna ku sirê girtibe, le-rizî... Bi awayekî bê mane, piyên xwe li erdê xistin û dest bi dîlaneke di cih de kir. Ew wîlo bi awayekî mekrohî çû û hat, fena ku bibêje: ma ne ez li welatê xwe me, ez çawa dixwazim. ezê wîlo bikim. Ez bi destê xwe me û ez azad im ...

Êvarê Ferhad venegeriya meqer. Pêşmergên ku li neçîrê pê re bûn, destpêkê bi nebûna wî nehesiyan. Lê dema lê varqilîn ku Ferhad ne bi wan re ye, pêlekê lê geriyên. Dawiyê ji neçarî û bi hêviya ku ewê bi xwe bê, bêyî wî hatin meqer.

Lê ku tarî kete erdê û ew nehat, dilê pêşmergan şeitî ku ew ne bi derewa ji hevalan ma. Berpîrsê liqê refek hinart, ku lê bigerin. Ji bilî Apê Mihemed, pêşmergên ku çûbûn neçîrê, tev di nav wî refî de bûn. Pirr geriyên; destê sibê pîrgî termê Ferhad bûn. Wî kaxezek nivîsîbû û tê de gotibû: "Tenê ez gunehkarê nêsa xwe me..."

Ehmedo wek her car, bêyî gotin nema, bi dengê bilind got:


-Ewrûpiyo wek Ewrûpiya kir. Ji şûna ku dijmin bikuje, xwe kuşt!

Pêşmergên pê re bi nefret û bi awirên nerazîbûneke bêsinor lê nêrîn. Lê dema laşê Ferhad hat veşartin, Ehmedo piştî kuştina bav û birayê xwe, cara pêşî hêşîr barandin...

Weşanên Nuh

Amadekar: Rohat

Rêzman a Zimanê Kurmancî, Reşîdê Kurd, 99 rûpel, Beyrût, 1991



Ev pirtûk cara pêşî li Şamê di sala 1956'an de hatiye weşandin. *Mehemed Ceza* jî di sala 1991'ê de ew wergerandiye Erebi. Di nav rûpelên pirtûkê de li ser beşên bingehîn yên gramatika Kurdî hatiye sekinîn, bi mîsalan, qaydeyên zimanê Kurdî tîna şîrovekirin. Reşîdê Kurd ne tenê bi gramatika zimanê Kurdî mijûl bûye, ji aliyê din ve helbest jî nivîsîne. Pirtûkeke ku ji helbestên wî yên heta niha ne çapkirî pêkhatî, di sala 1991'an de li Stockholmê bi navê "*Kerwan*" hat weşandin. (Bi pêşgotina Amed, bi nivîseke keça wî Perwîna Reşîdê Kurd li ser jiyana bavê xwe, 77 rûpel, ji aliyê Komela Jî-nên Kurdistanê ve li Swêdê hatiye amadekirin)

Nêrineke Rexneyî li Helbestên Kurdî, Deham Evdil Fetah (S.Y), Dar El Katib El Erebi, 183 rûpel, Şam, 1992



Lêkolîvan di vê xebata xwe de bêtir cîh dide avahiya helbestvaniya Kurdî û çend pîr-sên tehrî (form), li ser naverok û temayên helbestan zêde nayê rawestandî. Di lêkolînê de helbestvanên ku li ser hatine sekinîn, bêtir helbestvanên Kurdên Sûriyê, yên ku li Iraqê bi Kurmancî dinivîsin û helbestvanê Kurdên

Tirkiyê ne, nimûnek jî Şikoyê Hesen e, ew jî Kurdê Ermenîstanê ye.

Yên Perîşan, Azad Bavê Şihîn, 153 rûpel, Beyrût, 1991

AZAD BAVÊ ŞIHÎN

YÊN PERÎŞAN

Roman, bi gotina "*ji her kesê bê welat re ji her welatê bê serbestî re*" dest pê dike. Bûyerên romanê li Kurdistanê Iraqê derbas dibin. Nivîskar her çiqas car caran xwendevanan dibe salên 1970'an jî, lê di romanê de bi taybetî sala 1974'an, destpêkirina şerê Kurdan li dijî hukmeta Iraqê cihekî fireh digre. Ciwan û Şero wek çend xwendekarên Kurd ku li bajarê Mûsilê dimînin, piştî destpêka şer, xwendina xwe berdidin û ber bi çiyayên Kurdistanê bi rê dikevin. Hêvî, evîna van şagirtan û dengê top-tîngan di romanê de tev li hev dibin, di dawîya romanê de Ciwan Şehîd dikeve. "*Tirba Ciwan li pêşberî devê şikevtê kolan. Li cem dara hêjîrê*"... Di romanê de mirov rastî gelek çewtîyên îmlayê, rastnivîsinê tê.

ROMAN



Serpêhatiyên Mîran-1, Konê Reş, 47 rûpel, Beyrût, 1991

Ji zarogîna kurdî
SERPÊHATIYÊN
MÎRAN



Di vê berevokê de bi qasî bîst serpêhatiyên ku li ser mîrên Kurdan hatine gotinê, cîh digrin. Piraniya mîran, Mîrên Botan in. Berrevkar *Konê Reş*, her serpêhatî ji devê kê bihîstîye, di bin serpêhatiyên de wek bi nîşana "*jêder*" yek yek daye xuyakirin. Di pirtûkê de çawa tê xuya kirin, nêta Konê Reş heye wekî cildê duwemîn yê vê pirtûkê jî biweşîne. Pirtûk, bi pêşgotineke *Dilawerê Zengî* dest pê dike, di nivîsa xwe de ew bêtir li ser dewlemendî û giringiya folklorê Kurdî disekine.

Li xelkî Teh'lê Li Min Şirînê, Evdirehmanê Mizûrî, 56 rûpel, Beyrût, 1991

Li Xelkî Teh'lê
Li Min Şirînê



Di vê dîwanê de çend helbestên *Evdirehmanê Mizûrî* cîh girtine, piraniya helbestan li ser evîne û dil in. Ji van helbestan hinekên wan di hin kovar û rojnamên Kurdî de berê hatine çapkirin. Di dawîya pirtûkê de paşgotineke nivîskar jî cîh girtiye. Helbest hemû cara pêşî bi tîpên Erebi hatine çapkirin, *Dilawerê Zengî* ew wergerandine tîpên Latîni. *Dilawerê Zengî* berî vê dîwanê, dîwaneke nivîskar ya din jî, bi navê "*Ji Evîna Çirayên Kevin*" dîsa li Beyrûtê bi tîpên Latîni ji nû ve çap kiribû (1991).

SANIKA PÎRE Û LUYE

Arêkerdox:
DÊRSİMİZ

Wxaxto virên de jû pîre û jû luye benê. Pîre, Biza Kole dosena, sit bena kena binê purezine, Luye kî yêna wena.

Rêyê hên, di hên, rozê Pîre dariya xo sone kena, dariye kena zaf tuz; sit dosena, bena kena binê purezine, ho dana we. Luye onca yêna ke sit büro, Pîre dariye dana dimê Luye ro, dimê Luyê ci ra kena. Luye vana:

-Pîrê, dimê mi bide mi, bon pê çal-çilpê (çal-çilpê) ho kon.

Pîre kî vana: -Luyê, to sitê mi werdo! So leyê Biza Kole, Biza Kole sit dana to, biya bide mi, ez kî dimê to danî to, ho rê bere pê çal-çilpê ho bike.

Luye sona leyê Biza Kole, vana: -Biza Kole, sit bide mi, bon danî Pîre, Pîre dimê mi dana mi, ho rê bon pê çal-çilpê ho kon.

Biza Kole vana ke: -So leyê dare, dare velg dana to, biya bide mi, ez sit danî to, ti kî bere Pîre de, Pîre dimê to dana to, ho rê bere pê çal-çilpê ho bike.

Luye sona leyê dare, dare ra vana: -Darê, velg bide mi, bon danî Biza Kole, Biza Kole sit dana mi, bon danî Pîre, Pîre dimê mi dana mi, ho rê bon pê çal-çilpê ho kon.

Dare kî Luye ra vana: -So hênî ra awe biya kulêrê mi ke, ez velg danî to, bere Biza Kole de, Biza Kole sit dana to, bere Pîre de, Pîre dimê to dana to, ho rê bere pê çal-çilpê ho bike.

Luye sona leyê hênî, hênî ra vana: -Tenê awe bide mi, bonî kon kulêre dare, dare velg dana mi, bon danî Biza Kole, biza Kole sit dana mi, sit bonî danî Pîre, Pîre kî dimê mi dana mi, ho rê bonî pê çal-çilpê ho kon.

Hênî kî Luye ra vana: -Çenekûnê Pasay biya, va mi ser o kay kerê, ez kî awe danî to, ti bere kulêrê dare ke, dare velg dana to, bere Biza Kole de, Biza Kole sit dana to, sit bere Pîre de, Pîre kî dimê to dana to, ho rê bere pê çal-çilpê ho bike.

Luye sona leyê çenekûnê Pasay, ci ra vana: -Bêrê serê hênî de kay kerê, hênî awe dano mi, bon kulêrê dare konî, dare velg dana mi, bon danî Biza Kole, Biza Kole sit dana mi, sit bon danî Pîre, Pîre dimê mi dana mi, ho rê bon pê çal-çilpê ho kon.

Çenekê Pasay vanê: -So Qundureci ra ma rê qundurû biya, ma kî yêna serê hênî de kay kerê, hênî awe dano to, bere kulêrê dare ke, dare velg dana to, sit bere Pîre de, Pîre dimê to dana to, ho rê bere pê çal-çilpê ho bike.

Luye sona leyê Qundureci, Qundureci ra vana: -Qundurû bide mi, bon danî çenekûnê Pasay, çenekê Pasay yêna serê hênî de kay kerê, hênî awe dano mi, awe bon konî kulêrê dare, dare velg dana mi, velg bon danî biza Kole, Biza Kole sit dana mi, sit bonî danî Pîre, Pîre dimê mi dana mi, ho rê bon pê çal-çilpê ho kon.

Qundureci Luye ra vana: -So leyê kergû, kergî hakû danê to, biya bide mi, ez kî qundurû danî to, qundurû bere çenekûnê Pasay de, çenekê Pasay yêna serê hênî de kay kerê, hênî awe dano to, awe bere kulêrê dare ke, dare velg dana to, velg bere Biza Kole de, Biza Kole sit dana to, sit bere Pîre de, Pîre kî dimê to dana to, ho rê bere pê çal-çilpê ho bike.

Luye sona leyê kergû, ci ra vana:

-Kergênê, hakû bidê mi, bon danî Qundureci, Qundureci qundurû dano mi, qundurû bon donî çenekûnê Pasay, ê kî yêna serê hênî de kay kerê, hênî awe dano mi, awe bon konî kulêrê dare, dare velg dana mi, velg bon danî Biza Kole, Biza Kole sit dana mi, sit bon danî Pîre, Pîre kî dimê mi dana mi, ho rê bon pê çal-çilpê ho kon.

Kergî kî vanê: -So ma rê xizê ra qut biya, ma hakû dame to, ti kî hakû bere Qundureci de, o qundurû dano to, qundurû bere çenekûnê Pasay de, va ê kî bêrê serê hênî de kay kerê, hênî awe dano to, awe bere kulêrê dare ke, dare kî velg dana to, velg bere Biza Kole de, Biza Kole sit dana to, sit bere Pîre de, Pîre dimê to dana to, ho rê bere pê çal-çilpê ho bike.

Luye sona xizê ra qut wazena, vana: -Xizê, qut bide mi, bon danî kergû, kergî hakû danê mi, bon danî Qundureci, o kî qundurû dano mi, qundurû bon danî çenekûnê Pasay, ê kî yêna serê hênî de kay kerê, hênî awe dano mi, awe bon konî kulêrê dare, dare velg dana mi, bon danî Biza Kole, Biza Kole sit dana mi, sit bon danî Pîre, Pîre kî dimê mi dana mi, bon pê çal-çilpê ho kon.

Xizê kî vana: -So gawû ra sil biya, dormê mi şawax ke, ez kî qut danî to, bere kergû de, ê kî hakû danê to, hakû bere Qundureci de, Qundureci kî qundurû dano to, bere çenekûnê Pasay de, ê kî yêna serê hênî de kay kerê, hênî kî awe dano to, bere kulêra dare ke, dare velg dana to, bere Biza Kole de, Biza Kole sit dana to, sit bere Pîre de, Pîre dimê to dana to, ho rê bere pê çal-çilpê ho bike.

Luye sona leyê gawû, ci ra sil wazena, vana: -Gayênê, sil bidê mi, bon dor-mê xizê şawax kon, xizê kî qut dana mi, bon danî kergû, kergî hakû danê mi, hakû bon danî Qundureci, o kî qundurû dano mi, qundurû bon danî çenekûnê Pasay, çenekê Pasay yêna serê hênî de kay kerê, hênî awe dano mi, bon konî kulêrê dare, dare kî velg dana mi, bon danî Biza Kole, a kî sit dana mi, sit bon danî Pîre, Pîre dimê mi dana mi, ho rê bon pê çal-çilpê ho kon.

Gayî vanê: -So ma rê mereke ra simer biya, ma sil dame to, sil bere dor-mê xizê şawax ke, xizê qut dana to, qut bere kergû de, kergî hakû danê to, hakû bere Qundureci de, o kî qundurû dano to, qundurû bere çenekûnê Pasay de, ê yêna serê hênî de kay kerê, hênî kî awe dano to, bere kulêrê dare ke, dare velg dana to, velg bere Biza Kole de, Biza Kole sit dana to, sit bere Pîre de, Pîre dimê to dana to, ho rê bere pê çal-çilpê ho bike.

Luye sona leyê mereke, mereke ra vana: -Simer bide mi, bon danî gawû, gay sil danê mi, sil bonî dor-mê xizê şawax kon, xizê qut dana mi, qut bon danî kergû, kergî hakû danê mi, hakû bon danî Qundureci, Qundureci qundurû dano mi, bon danî çenekûnê Pasay, ê yêna serê hênî de kay kerê, hênî kî awe dano mi, awe bon konî kulêrê dare, dare velg dana mi, velg bon danî Biza Kole, Biza Kole sit dana mi, bon danî Pîre, Pîre dimê mi dana mi, ho rê bon pê çal-çilpê ho kon.

Mereke vana: -So serê mi bidawasne, siliyê ke vorê dilap mekerê. Ez simer danî to, bere gawû de, ê kî sil danê to, bere dor-mê xizê şawax ke, xizê qut dana to, qut bere kergû de, kergî kî hakû danê to, hakû bere Qundureci de, o kî Qundurû dano to, qundurû bere çenekûnê Pasay de, ê kî yêna serê hênî de kay kerê, hênî awe

dano to, bere kulêrê dare ke, dare velg dana to, velgî bere Biza Kole de, Biza Kole sit dana to, sitî] bere Pîre de, Pîre dimê to dana to, ho rê bere pê çal-çilpê ho bike.

Luye sona serê mereke, rêyê nata ho kena pa, rêyê do-ta, yêna leyê mereke, mereke simer dana ci, simer bena dana gawû, gay sil danê ci, sil bena dor-mê xizê şawax kena, xizê qut dana ci, qut bena dana kergû, kergî hakû danê ci, hakû bena dana Qundureci, Qundureci qundurû dano ci, qundurû bena dana çenekûnê Pasay, ê kî sonê serê hênî de kay kerê, hênî awe dano ci, awe bena kena kulêrê dare, dare velg dana ci, velgî bena dana Biza Kole, Biza Kole sit dana ci, sit bena dana Pîre, Pîre kî dimê Luye dana Luye.

Luye qayit kena ke Pîre dimê Luye morekû ra mûnito, kerdo rindek. Luye dimê ho cêna (gêna) sona, ho rê pê çal-çilpê ho kena.

Sanika ma îta de qediyê, bimanê rindî û wesiyê de.

FERHENGEK

awe: aw, owe, ow
ci ra: ti ra, jey ra, ja ra
ci ra kerdene: di ra kerdiş (dirra kerdiş)

çal-çilp (çal-çilp): şelp-telp, şep-tep

çenekê: keyneki, kêneki
dare: dari

dariye: darey
dim: dime, poçi, boçi, buweçe

dor-me: dor-mar, dor-mare, çarqirni, çarqirni, çorsme, çorşme, çorşme

ê: yê
hên: wina, ina, ena, ana, ona, ûna

hênî: hênî, eynî, yenî, îni
ho: xwe, xwi, xwu, xo, xu

îta: tiya, itiya, etiya, ewta, owta, wita, weyta

kî: zî, jî
le: ley, lê, heti

luye: lûw, luy, lû
moreke: mura, mûra

mûnitene (mûnutene): munitene, mûnayiş, apey dayiş

nata-dota: nata-bota, nata-wata, naşta-daşta, nayşta-dayşta, naşta-başta, naşta-yaşta, naşta-aşta, aşta-naşta

onca: ancî, ancîna, hewna, fina, rayna, gilana

pasa: paşa, padişa
pira soynayena: desawitiş, bide (bere) sawitiş

purezine: purozini, porcini, pirjini, pircini, pirojini, pirocini

qayit kerdene: 1)ewniyayiş, ewniyayiş, ewnayiş, hewniyayiş, howniyayiş, howniyeyiş, hewneyiş, howneyiş; 2)qayta kerdiş, miqayt kerdiş

raye: ray, rey, rê, finî, gilangi, gilongi, gerange, gerengi, hewi, donimi (duenimi), dolimi

rêyê: rayê, yew ray, yew hewi, gilangi, gilongi, yew gilangi, yew gilongi, yew donimi, yew dolimi

sane: şane, şone, şune
sanike: soniki, estaneki, istaneki, istaniki, istoniki; vistoneki, vistoniki, fistoneki

siliye: şilî, şillî, silî, varan, varon, yaxer, yaxir

sit: şit
sone kerdene: [qaydê têt]kerdişî rê] sawitiş, têt kerdiş

soynayene: sawitiş
şawax kerdene: şuwax kerdene, sebox kerdiş

tenê: tikê, biney, bineyk, binêk
tuz: têtj

va: wa (va kay kerê: wa kay bikî)
virên: verên, verîn

westye: weşî

Hûmara 128. a Armanci di na beyta cêrini bi şaşey him nêmcet vejyaybi him zî çend kelimey ya şaş nusiyaybi. Ma na ray (hewi) "temamê" na beyti cêr ra nusenî.

YEW BEYTA MİRİDANÊ ŞÊX SELAHEDDÎNÊ ŞÊX SE'ÎDÎ

Arêkerdox: HARÛN

We hinî ma ya nêraseno (?)
La Ella, dayîm Ella!

[La Ella, la Ella!]
La Ella, sabir Ella!

Şêxê mi omew Qerebegono
La Ella, heyron Ella!

Xewsê mi omew Qerebegono
La Ella, şîrîn Ella!

Xeber daya mirîdono
La Ella, şîrîn Ella!

Xeber daya mirîdono
La Ella, qirbon Ella!

Mirîdî yenî lek bi lekî (1)
La Ella, şîrîn Ella!

Mirîdî yenî lek bi lekî
La Ella, heyron Ella!

Îndadê (2) Şêxî çêher melek î
La Ella, qirbon Ella!

Îndadê Xewsî çêher melek î
La Ella, heyron Ella!

Gelo qûmo, ma xwî rî se kî?
La Ella, heyron Ella!

Çi ne'met o Homay dawo!
La Ella, qirbon Ella!

Çi ne'met o Ellay dawo!
La Ella, heyron Ella!

La Ella, şîrîn Ella!
La Ella, dayîm Ella!

Şêxê ma şêxê Kirdon o
La Ella, heyron Ella!

Şêxê ma şêxê Kirdon o
La Ella, heyron Ella!

Homay kerdo qismetî Kirdono
La Ella, şîrîn Ella!

Ellay kerdo qismetî Zazono
La Ella, dayîm Ella!

Pêxemberê ma dersê yê dono
La Ella, şîrîn Ella!

Pêxemberê ma dersê yê dono
La Ella, heyron Ella!

Şer'ay Muhemedî ruenûno
La Ella, heyron Ella!

Şer'ay Muhemedî ruenûno
La Ella, qirbon Ella!

Komo ki qedirê Şêxî zono
La Ella, heyron Ella!

Ella dono axret û îmono
La Ella, qirbon Ella!

Ella dono axret û îmono
La Ella, dayîm Ella!

La Ella, şîrîn Ella!
La Ella, qayîm Ella!

Komo ki qedirê Şêxî nyczono.
La Ella, heyron Ella!

Beno ombazê şeytonono.
La Ella, şîrîn Ella!

Axreti di nyeveyno îmono
La Ella, dayîm Ella!

Axreti di nyeveyno îmono
La Ella, şîrîn Ella!

La Ella, dayîm Ella!
La Ella, qayîm Ella!

La Ella, razîq Ella!
La Ella, heyron Ella!

Qirbon şêxê mi lacê Şêx Se'îd Efendî yo.

La Ella, şîrîn Ella!

Qirbon xewsê mi lacê Şêx Se'îd Efendî yo.

La Ella, qirbon Ella!

Tûrnê(3) Şêx Mehmud Feyzî yo.
La Ella, heyron Ella!

Tûrnê Şêx Mehmud Feyzî yo.
La Ella, qirbon Ella!

Nesla Şêx 'Elî Serpî (?) yo.
La Ella, heyron Ella!

Nesla Şêx 'Elî Serpî yo.
La Ella, qirbon Ella!

Şêxê mi omew Pirecmono (4).
La Ella, heyron Ella!

Xewsê mi omew Pirecmono.
La Ella, qirbon Ella!

Weyra mekonê ewliyayon o.
La Ella, heyron Ella!

Weyra mekonê ewliyayon o.
La Ella, qirbon Ella!

Zikir beno serê bonono.
La Ella, heyron Ella!

Zikir beno serê bonono.
La Ella, qirbon Ella!

Rueniş' venday Homay dono.
La Ella, qirbon Ella!

Ellaw serî'n 'efê ma dono.
La Ella, qirbon Ella!

Homay serî'n 'efê ma dono.
La Ella, qirbon Ella!

Eyro-meystî (?) binê salono.
La Ella, heyron Ella!

Malê dîna dîna di mono.
La Ella, qirbon Ella!

Şêxê mi omew şîyo Sîwono.
La Ella, qirbon Ella!

Xewsê mi omew şîyo Sîwono.
La Ella, dayîm Ella!

Xeber daya mirîdono.
La Ella, qirbon Ella!

Mirîdî yenî lek bi lekî.
La Ella, şîrîn Ella!

Mirîdî şêxê mi gelek î.
La Ella, qirbon Ella!

Mirîdî menşurê (5) mi gelek î.
La Ella, qirbon Ella!

Vengê şêxê mi kewto felekî.
La Ella, qirbon Ella!

Vengê xewsê mi kewto felekî.
La Ella, şîrîn Ella!

Gelo xwe bidî kîştay berî.
La Ella, heyron Ella!

Qûmo xwe bidî kîştay berî.
La Ella, qirbon Ella!

Şêx vêreno şûno safay verî.
La Ella, heyron Ella!

Şêx vêreno şûno garkay verî.
La Ella, qirbon Ella!

Şîyo ruenişto serê mîyûnberî.
La Ella, heyron Ella!

Dewamê ci riperê 7. di

"Bijî Hukûmeta Kurdistanê"

siyasî û parlementerên Kurd re li ser rewşa Kurdistanê Îraqê û îmkânên alîkariyê peyivîn. Daniele Mitterand di axaftina xwe ya li parlamentoyê de dilxweşiya xwe ya seredane xuya kir, soza berdewamiya alîkariyê da Kurdan. Wê girîngiya hebûna demokrasiyê wek şertekî bingehîn a jiyane anî pêş û got: "Madem baweriya we bi demokrasiyê heye, piştrast bin ku tev gelên cihanê li piştê we ne."

Wezîrê Frensî Bernard Couchner ji li parlamentoyê Kurdistanê peyivî û weha got: "Ez gelek şad im ku Kurd îro li parlamentoya xwe dicivin ku ji bona gihîştina vê hêviya dîrokî pir xebitîne û di vê riyê de gelekşehîd dane. Hilbijartina we li cihanê deng da, bû nimûne. Ez pir kexweş im ku ez û Xatûn Mitterand di roja îlankirina wezîran de li vir in. Biserketina we hem ji bo miletê Kurd, hem ji bo xelkê Îraqê gelek giring e. Û wê bibe nimûneya bichkirina demokrasiyê li Îraqê û li herêmê."

Bijî dostaniya gelê Kurd û gelê Frensî
Bijî Demokrasi li Parlamentoya Kurdistanê
Bijî Hukûmeta Kurdistanê."

Di roja 6.7.1992'an de dema Daniele Mitterand, wezîr Bernard Couchner û heyeta bi wan re berê xwe dan bajarê Helebçe, nêzî Silêmaniyê, tirimbêlek Land Cruisser tijî bombe ku li gor gotinan li rexerê sekinandî bû, piştî derbasbûna tirimbêla Mitterand û Couchner bi 9-10 saniyan hat teqandin. Daniele Mitterand û Bernard Couchner bê qeza ji teqînê xilas bûn. Lê zarokê 10 salî û 4 pêşmerge mirin û karmendekî Yekitiya Netewan û ji telewizyona Elmanî Sabine Raulbert ji tê de 19 kes birîndar bûn.

Tevî ku heta niha kesên gunehkar nehata girin ji, li gor îxbarên ji herêmê tén û nerehetiya Tirkiye, Îran û Îraqê li ser pêşveçûnên li Kurdistanê, her sê dewlet ji dikare li piştî bûyerê be. Wek tê zanîn li ser

devê Wezaretê Difaê ya Îraqê hatina Mitterand û Couchner bo Kurdistanê wek êrişek li ser serbixwebûna Îraqê hatibê îlankirin. Îran li ser pêşketinên li Kurdistanê Îraqê gazî Tirkiye û Sûriye kir ku her sê dewlet bi hev re rê li ber Kurdan bigrin.

Piştî teqînê, heyeta Frensî li gor programa xwe, çûn bajarê Helebçe. Her weha Mitterand û Couchner ji wir çûn nexweşxane ya ku birîndar lê ne.

Daniele Mitterand û Bernard Couchner di roja 07.07.1992'an de vegeyriyan Frensayê. Daniele Mitterand li ser pirsê: "Ji îro pê ve ji hûn ê alîkariya Kurdan bikin?", weha bersiv da: "Ez xwe nadim paş. Heta dawiyê ez ê alîkariya doza bi heq a Kurdan bikim."

Li gor nûçeyên ji deverê tén û li gor rewşa deverê, dibe ku Îraq, yan Îran yan ji Tirkiye li piştî vê teqînê be.

Hukûmeta Kurdistanê

SEROKWEZÎR: Dr. Fuad Mehsûm (YNK)

CIGIRÊ SEROKWEZÎR û wekaleten WEZÎRÊ HUNDIRKARÎ: Dr. Roj Nûrî Şawes (PDKÎ)

WEZÎRÊ GUHASTIN û GIHANDINÊ: İdris Hadî (PDKÎ)

WEZÎRÊ ÎNDUSTRÎ û ENERJİYÊ: Mihemed Emîn Mewlud Emîn (PDKÎ)

WEZÎRÊ KULTUR: Şerko Bêkes (YNK)

WEZÎRÊ MALÎ û ABORÎ: Dr. Selehedîn Mihemed Hesen Hefîd (YNK)

WEZÎRÊ ÇANDIN û AVDANIYÊ: Qadir Ezîz Mihemed Emîn (PZK)

WEZÎRA KARÛBARÊN BELEDIYAN û TURİZMÊ: Kafîya Silêman (YNK)

WEZÎRÊ KARÛBARÊN PÊŞMERGE: Kemal Muftî (YNK)

WEZÎRÊ TENDURISTÎ û KARÛBARÊN CIVAKÎ: Kemal Şakîr (PKÎ)

WEZÎRÊ AVAKIRIN û PÊŞVEBIRINÊ: Dr. Memun Nûr Mihemed Bîrfîkanî (PDKÎ)

WEZÎRÊ ALÛKARIYA MIROVÎ û HEVKARIYÊ: Mihemed Tew-

fîq Rehîm (YNK)

WEZÎRÊ WEQFAN û KARÛBARÊN DÎNÎ: (PDKÎ)

WEZÎRÊ PERWERDEKIRINÊ: Dr. Nasîh Xefûr (PDKÎ)

WEZÎRÊ KAR û CIWARKIRINÊ: Yûnadîm Yûsîf Kenna (Tevgera Demokratîk a Asûrî)

WEZÎRÊ DADGERIYÊ (Edaletê): Kesek ji Tevgera Îslamî ku hîn nehatiye dest nîşan kirin.

Her weha li parlamentoyê ji bo her wezaretê, ji bo destûra navxwe a parlamentoyê û karûbarên civakî ji endamên partî û rêxistinên li parlamentoyê hin komîte ji hatin danîn.

Biryara rakirina Alaya Îraqê ji Parlamentoya Kurdistanê

Di celseya roja 17.6.-1992'an de li parlamentoya Kurdistanê munaqeshe li ser pêşniyara rakirina alaya Îraqê ji parlamentoyê, hat kirin. Bi pêşniyarên serokê grûba PDKÎ Dr. Roj Nûrî Şawes û serokê grûba YNK Kemal Fuad û bi erêkirina piraniya dengên parlamentaran biryar hat girtin ku alaya Îraqê li parlamentoya Kurdistanê neyê daleqandin. Parlamentaran ji piya û bi çepikên germ kexweşiya xwe ji bo biryarê nîşan dan. Li ser van pêşketin û qayîmkirina serketinên bidestxistî, Tirkiye û Îran nerehetiyek pir mezîna xuya dikin. Di 5.7.-1992'an de di rojname TEHERAN TIMES de Îran gazî Tirkiye û Suriyê

dike ku her sê welat bi hev re pêşî li pêşketinên li Kurdistanê Îraqê bigrin. Tirkiye di her fîretê de acizîya xwe xuya dike, hem di raya giştî ya xwe de, hem ji di danûstandinên xwe yê diplomatîk de keftelefteke pir mezîna xerc dike ku Kurd dezgehên ber bi dewletbûnê ve danemezînin. Tirkiye di-xwaze di zelalbûna statûya siyasî û di ekonomîya Kurdistanê Îraqê de xwedî rola esasî be.

Pirozbahiya SerokêParlamentoya Ewrûpayê

Serokê Parlamentoya Ewrûpayê İgon Klîpç, bi helketina hilbijartinên giştî yê li Kurdistanê Îraqê telgrafêke pirozbahiye ji serokatiya Cebheya Kurdistanê Îraqê re şand. Li jêr em pirozbahiye diweşînin:

Parlamentoya Ewrûpayê bi germî pêşwaziya hilbijartinên giştî ku di 19 ê Gulana 1992'an de li herêma Kurdistanê Îraqê a xwedî otonomî, ji bo hilbijartinan parlamentoyê herêmî û demokrat, bi cih hatin.


Parlamentoya Ewrûpayê piştevaniya xwe ji bo gelê Kurd dubare dike; gelê ku li herêmê ji bo bichhatina aştiyê tediqoşe. Pir mixabin Parlamentoya Ewrûpayê nekarî çavdêrên xwe ji bo hilbijartinan bişîne, lê di nêzîktirîn wext de Parlamentoya Ewrûpayê wê heyeteke xwe ya resmî bişîne herêma otonomî ya Kurdistanê.

Serokê Parlamentoya Ewrûpayê.

Dr. İgon Klîpç
15.5.1992

X a ç e p i r s

Amadekar: S. Rêving



Çeperast: 1-a- Stranbejeke bi navûdeng a Kurd b- Pirsek (berevajî) 2-a-Jan, 'derd'. b- Li hinek deveran ji "utî"yê re dibêjin (berevajî) c- Bi Soranî "êvar" (berevajî) 3-a- Serserî, kesê beredayî b- Kesê nekaribe bipeyive, zimanê wî negere. 4-a- Mîntiqe, herêm b- Li devera Botan ji Kulfîlka Nîsanê re dibêjin. 5-a- Navê rojê b- Pîr, extiyar. 6-a- Li Efrîqayê çemek. b- Mêweyek c- rih, kok. 7-a- Navê teyrekî. b- Dijmin, ne dost. 8-a- Bi Soranî "saniye" (berevajî) b- Sînonîmeke "va ye". 9-a- Sînonîmeke "na", "no". (berevajî) b- Pirsek c- Pez, keval (berevajî) 10-a- Sînonîmeke "şerpeze" 11-a- ne kevin b- Navê teyrekî ku dibêjin "rê li karwaniyan wînda dike û dibe sebebê kuştina wan. 12-a- ax b- Xwendina herfa pêşîn ya

nav û paş navê artistêkî serreke di filmê Amerîkanî "Dallas" de (berevajî) c- Sînonîmeke "hew".

Serejêr: 1-a-Li Kurdistanê Tirkiyê bajarek b- Şefeq 2-a-aletê ku mirov pê porê xwe rast dikin (berevajî) b- Navê cihê ku zend û bendê mirovan digihe hev. c-ji zikê dewaran re tê

Bersîva Hejmara berê

Çeperast: 1-a) Fuad Mehsûn, 2-a) Id, b) zê, c) risî, 3-a) do, b) ra, c) sey, 4-a) oleg, b) sorik, 5-a) kelemî, b) ar, 6-a) aramî, b) dawî, 7-a) ay, b) çaydan, 8-a) spih, b) armanç, 9-a) piyan, b) au, 10-a) sî, b) rênas, 11-a) oteç, b) asîman, 12-a) nuh, b) ûz, c) hêvên.

Serjêr: 1-a) firoke, b) sason, 2-a) ud, b) le, c) ap, d) îtu, 3-a) elayip, b) eh, 4-a) dadger, b) hirç, 5-a) maç, b) yê, 6-a) ez, b) sîma, c) anaz, 7-a) hêro, b) îyanas, 8-a) arî, b) dr., c) sîh, 9-a) ûr, b) dama, c) mê, 10-a) nîsk, b) ana, c) çav, 11-a) se, b) aw, c) na, d) nê, 12-a) diyarî, b) cur

gotin3-a- Di Kurmançî de pronavekî îşaretê b- Li Kurdistanê cihê pîroz yê êzîdîyan. 4-a- Jina ku li dêre xizmeta dîn dike. b- Hin kes, çend kes. hin tişt, çend tişt. 5-a- Kesê ku li ser piştê qantir, yan keran tişt û miştê dibe gundan û difiroşe. b- Ne tiştêk. c- Sala bihurî, sala çûyî. 6-a- Navê teyrekî ku nîşana bê oxiriyê ye. (berevajî) b- Kurt c- Lempe, elektrîk 7-a- eks, dengvedan. b- Navê kovareke Kurdî ku li Kurdistanê Îranê derdiçe. 8-a-Li Kurdistanê Tirkiyê navê eşîrekê, her weha navê qîzan e jî. b- Navê cûrekî mûsikî (berevajî) 9-a- Sembola kinkirî ya "Numara", "number". b- Navê pîreka Celadet Bedirxan ku roja 1'ê Xizîrana 1992'an li bajarê Banyas, li Sûriyê çû heqîya xwe. 10-a- Têvlîhev b- Dilber, hejêkirî c- pirsek 11-a- Meqamên mûsikî b- agir (berevajî) c- enstrumenteke mûsikî 12-a- Kevirê ku li ser gora kesê mirî dadiçîkinin. b- ne germ c- heywanekî ji famîlya kûçikan ku bi piranî di nêçîran de wek alîkarî tê bi kar anîn.

NIT INTERNATIONAL
TOURS & TRAVEL ☎ 08-165100

ÅTERFÖRSÄLJARE TILL		ROYAL JORDANIAN
AUSTRIAN	SAS	OLYMPIC AIRWAYS
TURKISH AIRLINES		
AMMAN	2 MÅNADER	4500 kr
DAMASKUS	3 MÅNADER	4500 kr
ISTANBUL	1 MÅNAD	3590 kr
	2 MÅNAD	3690 kr
	ETT ÅR	3890 kr

VI HAR INRIKES BILJETTER TILL

ADANA- ANKARA- ANTALYA- DALAMAN
DIYARBAKIR- GAZIANTEP- IZMIR

BOKA I FÖRVÅG BEGRÄNSADE PLATSER
50 Kronor rabatt för den som kommer med denna annons

Birger Jarlsgatan 107 113 56 STOCKHOLM



BEROS

Mahmûd Lewendî

Nameyek ne ji bo xwendevanan

Merheba ji te re,
Nuha saet 12'ê şevê ye û ez li ser
computera xwe ji te re van çend rê-
zan dinivîsim. Berî wê min karê
xwe dikir, jixwe tu zanî kar çi ye.

Bistek berê spagettî ya ku min ji
do de çê kiribû, min germ kir û xwar,
heta sibê jî ewê idare bike, ger xelas
bibe jî Xwedê mezin e, bila canê hê-
kan sax be. Ma qey mirîşk nemi-
rine! Lê heta tu werî ez hêkan nekim
baş e! Gelo te zanibû ku hêkerûn
xwarineke millî ya xwendevan û
bêkaran e. Her çendî ez ne xwende-
van im, lê ji bo demek muweqet
bêkar im.

De neyse lê, ev çi hêk bûn îcar di
serê me re derketin, ma qey tiştê
din nema ku em behs bikin? Xwedê
bela hêk û mirîşkan bide ku ev serê
saetekê ye ketine nav computera
min û jê dernakevin. Ji ber wê ji
min ji bira kir ku halê te bipirsim.

Heqet tu çawa yî? Baş î? Kêf hal?
Êêêê! daha, daha, başqe başqe tu
çawa yî? Diya te, xuşkên te, birayên
te, birazyên te, xwarziyên te, der û
dor û cîranên te, hemû çawan in, baş
in? Înşallah giş baş in. Ji alî min de
silavan li hemûyan ke. Têm destê
mezinan, çavên biçûkan maç di-
kim.

Êêêê, hela bêje, daha başqe çi
heye, çi tune? Dunya çawa ye, zad
û genim çawa ye, pez çawa ye? Li vê
derê hewa dîrimî ne baş e. Tu dibêji
qey tûwaleta melegên Xwedê qul
bûye û bi ser bajarê me de dirije, her
roj baran e, şilî ye, şilope ye. Welê
xuya ye mewsimên salê serxweş ke-
tine, li hev geryane, rîya xwe şaş ki-
rine, ji ber wê ji zivistana ku du meh
berê xelas bûbû, dîsa bi paş de vege-
ya.

Gerçi carna tav dixwaze serê xwe
di ber ewrên reş û tarî re derxe û bi-
bêje "vaye ez ji heme", lê bi şîrqîna
birûskên har, dîsa xwe davêje paş
ewrên reş.

Bawerîya te ji Xwedê hebe, ji ruyê
vê baran û şilîyê de, jîrgî tu çûyî, min
çar şemsiye, du cot sol, sê cot gore, du
pantor, gomlegêk û qocixek kevn
kirin û avêtin. Nuha tenê
şemsiyeyek min maye ku ew ji orta
wê qule. Her çi cara ku ji bo kîrîna
çar hêkên mirîşkeke xain derdike-
vim der ve, di wê quluka şemsiya
min a qul re barana dunyê wek
çemê Dicleyê bi ser min de tê xwarê.

Neyse ligel hêkên xwe ez şil û şip
têm malê.

Tu zanî şilbûn tiştê ne baş e.
Çimkî mirov pir zû bi nezlê di-
keve. Lê ji aliyê din ve ji mirov ji
şuştina cilan xelas dibe. Yan na, tu
zanî ku li vî welatê gawiran
şuştina cilan çiqas zehmet e; hê tu
yê rabî cilên xwe derxi, bavêji
makîna cilan, derman têxê, pêl
pişkoja wê kî, dereca wê eyar kî,
seatekê li hêviyê bisekinî, paşê
derxi bavêji makîna guvaştinê,
pazde deqqan ji li hêviya wê bi,
pişt re dîsan derxe, girt, girt, girt,
bibe bavêje makîna zuhakirîne
(qurutmê) niv seetê ji li benda qu-
rutmê bisekine, paşî dîsan derxe,
qat ke, dûz ke, rast ke û bine ûti ke
û dîsan qat ke û rake. De xwedê
hebîni bêje! Yanê nuha barana ku
bi ser min de dibare û min şil û şip
dike, lê ji alîki de ji cilên min dişo,
ji vê zehmetîya ciluştina modern
baştir nîne?

Axx, dunya axx! Disa derd û
kulên min rabûn. Jinê xelkê ji
bila bibêjin em jin in. Jinên xelkê
cilên mîrê xwe dişon, utî dikin,
babet babet paste û xwarinan çê di-
kin, a min ji xwarina ku ez
çêdikim dixwe û begem nake û bi
ser de ji tebaxa xwe ranake û pişt re
ji dibêje "ji min re çayê bîne!". De
were kirasê xwe neçirîne!

Min biryara xwe daye. Ez çend
hevalên din ên wekî xwe bibînim,
ezê Komela Mîrên Bîndest de-
ynim, daku em bikaribin li dij ji-
nên zordest û serdest têkoşîna xwe
ya mîranîyê bi pêşde bibin û di de-
mên pêş de em dîsa bikaribin bi-
bin serdest. Heqet bira-mirayên
te, an jî merivên te yên mîr ku ne-
heqî li wan dibe hebin, adresa
wan ji min re bişîne belkî ew ji bi-
bin endamê komela me, daku bi-
karibin bi rîya komela me li heq û
huqûqên xwe bigerin.

Wîî, ma tu çima diqeherî, ma
ez rastîyê dibêjim. Jixwe rastî tîrş
e. Mîrekî carekê rastîyek gotibû,
jinên heft gundan berra wî dabûn
ew ji gund qewitandibûn.

Neyse, neqehere. Tu mecbûrî
derdê min bikşîni. Jixwe ez feqîr
im, ez gune me, ez bê kes im, ez bê
hal im, ma qet gunehê te bi min
nayê. Li vê derê, li vî welatê gawir
ên wek zerika hêkê, bêyî te tu ke-

sekî min tune. Diya min, bi-
rayê min, der û dor û cîranên
min, heval û hogirên min
hemû li wê derê ne, ma tu ji ji
min bixeyidî ezê berê xwe bi
kude kim?

De neyse neqehere, bise ez ji
te re pêkenînekê bibêjim, belkî
kêfa te were çî:


Yek ji yekî din dipirse:
-Gelo çend babet jin hene?
Yê din:
-Du babet, yek ji wan pîr di-
axîfe, ya din jî qet devê wê nase-
kîne!

Ez dibêjim bi vî pêkenîne
tuyê du kilo bigrî, ne wa ye?
Wexta ku tu ji vî derê çû tu 67
kilo bû, ne? Îcar tuyê bibi 69
kilo, Xwedê zêde bike û ji serê
me ji kême ke!

Mêze tu bawerîyê bi
mêzînen wê derê neynî hal!
Çimkî Diyarbekir nuha pir
germ e, û tu zanî ji ber germa
Diyarbekirê hesin ji dihelin,
êêê mêzîni ji tu zanî ji hesin e.
Mumkun e ew mêzînen ku tu
hildikişî ser, giraniya te 50 an
ji 52 rê dide, eman eman, nebe
nebe tu bawerîyê pê binî û
billeheq ji kêfa xwe neyne.
Çimkî mêzîna ku ji germa bi-
hele, bawerî pê nayê. Ya baştir
ew e ku havinan li vir, zivista-
nan ji li Diyarbekirê xwe biwe-
zînine. Bê guman e min
pêşniyar e. Te di yanê aqil, jix-
we ji berê de bav û kalan gotine
"aqil ji aqila ustuntir e" û dîsa
bav û kalan -nizanim ji bo kê
gotine lê- gotine "aqilê sivik û
barê giran". Tu dîsa xeyidî? Na,
nexeyide û neqehere, çimkî
gotînen bav û kalan li ciyekî
wek hedîsên pêxemberan e. Û
divê em hurmeta wan bigrin,
yan na mirov yekser diçe cah-
nimê. Cahnime jî agir e. Mirov
tê de dişewite dibe kizirik, ûff
pir pis e! Xwedê me ji agirê cah-
nimê û ji kiloyên zêde bisit-
irine.

Welle ez dibêim êdî bes e,
çimkî xewa min tê, ez êdî nika-
rim dewam bikim. Hema de
kiloyan -pardon- silavan li
herkesî ke, tîm kiloyên mezi-
nan û giramên biçûkan! Wîî ev
çi bû. De hema gelek silav.


Ex



Abdurehman Qasimlo (1930-1989)

Di siyemîn salvegera şehîdbûna A. Qasimlo de, em wî û hemû kesên di rîya rizgarbûna Kurdistanê de şehîdbûnê bi giramî bi birînin

Armanç



Vedat Aydın (1954-1991)

Di yekemîn salvegera şehîdbûna Vedat Aydın de, em wî û hemû şehîdên tevgera rizgarî-xwaziya Kurdistanê bi giramî bi birînin.

Armanç

Parlamentêrên Kurd dîsa vegeyriyan HEP'ê

Parlamentêrên HEP'ê ku di lista SHP'ê de hatibûn hilbijartin û pişt re jî ji SHP'ê istîfa kiribûn, bi navê "**Partiya Azadî û Wekhevîyê**" (Özgürlük ve Eşitlik Partisi-ÖZEP) partiyeke din di 25'ê Heziranê de ava kirin.

Li gor qanûnên Tirkiyê parlamentêrên ku ji partiyeke istîfa bikin û bikevin partiyeke din, pêwîst e ew berê **partiyek hulle** ava bikin pişt re jî ev partî bi partiyeke din re bibe yek. 18 parlamentêrên ku ji SHP'ê istîfa kiribûn jî ev proses anîn çî û dîsa vegeyriyan partiya HEP'ê.

Partiyek ku di meclîsa Tirkiyê de grûba xwe ava bike, pêwîste ku 20 parlamentêrên wê hebin.

ne karê aqila ye lê rast e

Amadekar: Hesên Mizgîn

★ Ewr ji dilopên biçûk ên jî avê yan jî ji qeşa kristal ku bi buxara avê ya di hewayê de peyda dibin, pêk tê. Di mêtro kûbeke ewrê kumulûs de nêzî 50 mîlyon dilopên avê hene û çapa dilopekê nêzî 0.01 mm. ye.

★ Alimên Fransî bi keştiyêke asîmanî ya Rûsî re dê di sala 1996'an de balonek bişînin Marşê. Balon wê di rojekê de nêzî 100 km bifire û heya nêzî 100 rojan wê resimên erdê Marşê bişîne dinê. Balon wê di nava rojê de bifire, lê bi şev wê di ciyê xwe de raweste.

★ Teknîsyenên şirketa Hewlett-Packard li

DYA'yê saetek nû çêkirine. Ev saet di 1.6 mîlyon salî de sanîyêkê bi pêş yan jî paşde diçe.

★ Li gor lêkolîneke nû insan ji tiştê ku dixwîne %10, jî tiştê ku dibihîze % 20, jî tiştê ku dibîne %30 û jî tiştê ku hem dibîne û hem jî dibihîze %70 bi birîne.

★ Japonî bi sistemeke nû ya datayê dikarin resmê zarokê hêj di zîkê diya xwe de ye, texmîn bikin. Data bi rehetî resmê zarok wê di 7 saliya xwe de çawa be, derdixe holê. Data jî resmên dê û bavê hereket dike.

★ Li gor lêkolîneke insanên dirêj ji insanên kurt biaqiltir in.

★ Zarokên nûzayî eger diya wan alkol vexwaribe zû bi zû biçûkên diya xwe namijin. Alkol tama şîrê dê diguherîne. Zarokên nûzayî jî şîr pîrîr hez dikin. Eger dê şîr xwaribe zarok bi eşqeke mezin û bi awayekî enerjîk biçûkên diya xwe dimijin.